# ZANISTNAMEya Felsefeyê

Çapa pdf. ya gotara

## Realîzma Siyasî Di Pêwendiyên Navneteweyî De

Nivîskar: W. Julian Korab-Karpowicz

Wergêr: Aydın Ekin

Edîtor: Samî Hêzil

Korab-Karpowicz, W. Julian. “Realîzma Siyasî Di Pêwendiyên Navneteweyî De”. *Zanistnameya Felsefeyê* (Zivistana 2026ê). Aydın Ekin (Wergêr). Lînk = <https://zanistname.com/en/entries/realism-intl-relations_nk>.

Navnîşana gotara orjînal li *Ansîklopedîya Felsefeya Stanfordê*:

Korab-Karpowicz, W. Julian, “Political Realism in International Relations”, *The Stanford Encyclopedia of Philosophy* (Winter 2023 Edition), Edward N. Zalta & Uri Nodelman (eds.), URL = <https://plato.stanford.edu/archives/win2023/entries/realism-intl-relations/>.

Perbendî: Arvand Salari

Hemû mafên vê berhemê parastî ne ji aliyê *Zanistnameya Felsefeyê* ve.

https://zanistname.com/

# Realîzma Siyasî Di Pêwendiyên Navneteweyî De

Daniel M. Hausman

Wergêr: Aydın Ekin[1]

Di zanista pêwendiyên navneteweyî de teoriyên gelemper an perspektîfên teorîk hene ku li dijî hev in. Realîzm, ku her wiha wekî realîzma siyasî jî tê zanîn, nêrîneke siyaseta navneteweyî ye ku li ser aliyê xwe yê hevrikî û hevnegirtî disekine. Realîzm bi piranî bi îdealîzm an lîberalîzmê re tê berawirdkirin ku li ser hevkariyê disekine. Ji bo realîstan, di qada navneteweyî de aktorên sereke dewlet in ku bi ewlehiya xwe mijûl in, ji bo berjewendiyên xwe yên neteweyî tevdigerin û bo hêzê têdikoşin. Aliyê neyînî yê sekna realîstan a li ser hêz û berjewendiyan pirî caran şikberiya wan e ku derbarê eleqeya normên exlaqî bi pêwendiyên di navbera dewletan de ye. Siyaseta neteweyî qada otorîte û hiqûqê ye. Lê belê siyaseta navneteweyî, ku carinan wisa dibêjin, kadeke bêdadwerî ye. Ev kad jî bi pevçûna aktîf an gengaz tê karakterîzekirin ku di navbera dewletan de ye û standardên exlaqî li vir ne lidar in.

Lê helbet hemû realîst hebûna exlaqekî rêzikparêz di pêwendiyên navneteweyî de înkar nakin. Ferqa di navbeyna van her duyan de divê baş bê fahmkirin: realîzma klasîk- ku bi teorîsyenên sedsala bîstem ên wekî Reinhold Niebuhr û Hans Morgenthau ve tê nimadin- û realîzma radîkal an ekstrem. Digel ku li ser têgiha berjewendiya neteweyî disekine, realîzma klasîk ne ew doktrîna Machiavelliî ye ku bi vî rengî ye: “her tişt bi aqilê dewletê ve tê peyitandin” (Bull 1995, 189). Ne jî realîzma klasîk pesndana şer û pevçûnê di nav xwe de dihewîne. Realîstên klasîk di siyaseta navneteweyî de gengaziya daraziya exlaqî red nakin. Ji vê yekê bêtir, realîstên klasîk moralîzmê rexne dikin- vegotina exlaqî ya razber ku rastiyên siyasî nahesibîne. Realîstên klasîk giringiya exlaqî didin bizava siyasî ya serkeftî ya ku

1. Xwendekarê Masterê ye li Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Beşa Çand û Zimanê Kurdî, Mêrdîn, Tirkiye, aekinn21@gmail.com, ORC-ID 0009-0001-6716-3977

bingeha xwe ji basîretê digire: ew jî şiyana darizandina rastiya bizavekê ji nav alternatîfên gengaz li ser bingeha encamên wê yên siyasî yên mihtemel e.

Realîzm nêzîkbûnên curbicur di nav xwe de dihewîne û xwedî tradîsyoneke teorîk a dirêj e. Di nav bavên wê yên avakar de, pirî caran navê Thucydides, Machiavelli û Hobbes tê bilêvkirin. Ciyê realîzma klasîk a sedsala bîstem bi piranî ji aliyê neorealîzmê ve hatiye girtin ku hewl dide nêzîkbûneke bêtir zanistî bîne lêkolîna pêwendiyên navneteweyî. Hem realîzma klasîk û hem jî neorealîzm ji aliyê teorîsyenên PN[1]yê ve hatin rexnekirin ku perspektîfên lîberal, rexneyî û post-modern dinimînin. Rageşiya di navbera hêzên desthilatdar de- ku çi qas dihere zêde dibe-nîqaşa realîst-îdealîst di sedsala bîstem de ji nû ve anî rojevê û bû sedema vejîna eleqeya bo tradîsyona realîst.


- 1. Rehên Tradîsyona Realîst
  - 1.1 Thucydides û Giringiya Desthilatê
  - 1.2 Rexneya Machiavelli Ya Ji Bo Tradîsyona Exlaqî
  - 1.3 Rewşa Xwezayê Ya Anarşîk A Hobbes
- 2. Realîzma Klasîk A Sedsala Bîstem
  - 2.1 Zordana E. H. Carr Ji Bo Îdealîzma Utopîk
  - 2.2 Rêgezên Hans Morgenthau Yên Realîst
- 3. Neorealîzm
  - 3.1 Pergala Kenneth Waltz Ya Navneteweyî
  - 3.2 Bervêdanên Li Dijî Neorealîzmê
- 4. Encam: Karaktera Hişyarker û Guherbar A Realîzmê
- Bîbliyografî
- Çavkaniyên Înternetê Yên Din


1. Pêwendiyên Navneteweyî (t.w.)

# 1. Rehên Tradîsyona Realîst

## 1.1 Thucydides û Giringiya Desthilatê

Wekî teorîsyenên klasîk ên siyasî yên din, Thucydides (derdora salên 460î – 400î B.Z.) siyaset wekî qadekê dît ku pirsên exlaqî di nav xwe de dihewîne. Ya herî muhîm, ew dipirse ka gelo rêberiya pêwendiyên di navbera wan dewletan de ku desthilat bo wan giring e ji aliyê normên dadwerî ve dikare bê kirin. Berhema wê ya bi navê *Dîroka Şerê Peloponezî* di esasê xwe de ne xebateke felsefeya siyasî ye û ne jî teoriyeke domdar a pêwendiyên navneteweyî ye. Piraniya vê xebatê, ku tomareke qismî ya şerê çekdarî yê di navbera Atîna û Spartayê de pêşkêş dike ku di salên 431an – 404an B.Z. de qewimî, ji axaftinên dualî yên kesan pêk tê ku aliyên dijber ên mijarekê nîqaş dikin. Digel vê yekê, ger berhema *Dîrok*ê wekî tekane teksta klasîk a pejirandî di pêwendiyên navneteweyî de hatibe saloxandin û ger wê ji Hobbes heta bi zanyarên hevçerx ên pêwendiyên navneteweyî gelek teorîsyen han dabin, ev ji ber wê yekê ye ku ew ji kronîkeke bûyeran wêdetir e, û mirov dikare sekneke teorîk jê derxe. Realîzm di axaftina yekem a Atînayiyan de tê derbirîn ku di *Dîrok*ê de hatiye tomarkirin- axaftineke ku di wê nîqaşê de hat pêşkêşkirin ku yekser beriya şer li Spartayê pêk hat. Her wiha, di wî awayî de, ku Thucydides pê sedema şerê Peloponezî rave dike, perspektîfeke realîst tê nîşankirin û her wiha di "Diyaloga Meliyan" a navdar de, di vegotinên nûnerên Atînayî de tê nîşankirin.

### 1.1.1 Taybetmendiyên Realîzmê Yên Gelemper di Pêwendiyên Navneteweyî de

Realîstên pêwendiyên navneteweyî giringiyê didin sînordariyên ku ji aliyê xwezaya wan mirovan ve, ku ew wan egoîst dihesibînin, û ji aliyê tunebûna hikûmeta navneteweyî ve li ser siyasetê tên kirin. Bi hev re ev babet dibin tevkarê paradîgmayeke pêwendiyên navneteweyî ku bingeha xwe ji pevçûnê distîne, ku tê de aktorên sereke dewlet in, ku tê de desthilat û ewlehî dibin meseleyên sereke, û ku tê de bo normên exlaqî bi tenê ciyekî biçûk heye. Berhevoka pêşaneyan derbarê aktorên dewletê, egoîzm, anarşî, desthilat, ewlehî û exlaq de ku tradîsyona realîst vedibêjin hemû di Thucydides de mewcûd in.

(1) Xwezaya mirov bo realîzma siyasî ya klasîk pêşaneya bingehîn e. Realîst

mirovan wekî bi awayekî zikmakî heta wê astê egoîst û berjewendîperest dibînin ku berjewendî ji rêgezên exlaqî giringtir dibin. Li nîqaşa li Spartayê, ku di pirtûka yekem a *Dîrok*a Thucydides de tê pênasekirin, Atînayî pêşaniya berjewendiyê li ser exlaq tesdîq dikin. Ew dibêjin ku hesibandinên rast û xelet “tu carî mirov ji firsendên mezinbûyînê bi dûr nexistine ku ji aliyê desthilata raser ve tên pêşkêşkirin” (beşa yekem, paragrafa 76em).

(2) Realîst, û bi taybetî neorealîstên îro, tunebûna hikûmetê, herfiyen *anarşi*yê, wekî diyarkera sereke ya derencamên siyasî yên navneteweyî dibînin. Tunebûna otorîteyeke hevpar a qanûndaner û lêferzker tê wê wateyê ku, ew angaşt dikin, arenaya navneteweyî esasen pergaleke alîkarî-bo-xwe ye. Her dewlet bi xwe ji berdewamiya xwe berpirsiyar e û serbest e ku berjewendiyên xwe diyar bike û li pey desthilatê bikeve. Ji ber vê yekê, anarşî dibe sedema rewşeke wiha ku tê de desthilat di şekilandina pêwendiyên navdewletî de xwedî roleke serkutker e. Di gotinên nûnerên Atîniyan li Melosê, bêyî otoriteyeke hevpar ku dikare tertîbê qayîm bike, “dewletên serbixwe (bi tenê) dema ku hêzdar in zindî dimînin” (5.97).

(3) Realîst çi qasî cîhana dewletan wekî anarşîk dibînin, ew bi heman awayî ewlehiyê jî wekî meseleya navendî dibînin. Ji bo ku ewlehiyê bi dest bixin, dewlet hewl didin ku hêza xwe zêdetir bikin û bo armanca texilandina erîşkarên potansiyel dikevin nav karê hevsengkirina desthilatê. Şer tên kirin da ku pêşiya neteweyên ku li dijî hev di pêşbaziyê de ne bê girtin ku ji aliyê leşkerî ve hêzdartir nebin. Thucydides, her çi qas ferqa di navbera sedemên Şerê Peloponezî yên acîl û yên bingehîn diyar dike jî, sedema wî ya rasteqîn di tu bûyeran de nabîne ku yekser beriya wî şerî qewimîn. Ji dêvla vê yekê, li gor wî sedema şer belavbûna desthilatê ya guherbar a di navbera her du blokên bajar-dewletên Yewnanî de ye: Komeleya Deliyan di bin banê pêşengiya Atînayê de, û Komeleya Peloponezî, di bin banê pêşengiya Spartayê de. Li gor wî, zêdebûna hêza Atînayiyan kir ku Spartayî bo ewlehiya xwe dilbitirs bibin, û loma vê yekê ew han dan ku bikevin şer (1.23). Bi referansdayîna vê rewşê, Graham Allison biwêja “dafika Thucydides” navdar kir ji bo ku wê xetereyê vebêje ku dema hêzeke li ber bipêşketinê dibe reqîbê hêzeke bicihbûyî (2017).

(4) Realîst bi gelemperî ji pêwendîdariya exlaq bi siyaseta navneteweyî ve

şikdar in. Ev yek dike ku ew angaşt bikin ku di pêwendiyên navneteweyî de bi wateyeke rêzikperest tu cî bo exlaq tune ye, an ku di navbera pêdiviyên exlaq û pêwîstiyên bizava siyasî ya serkeftî de rageşiyek heye, an ku dewlet xwedî exlaqê xwe ne ku ji exlaqê kevneşopî cuda ye, an ku exlaq, ger bê sepandin, bi tenê bi awayekî amûrî bo rastderxistina tevgerîna dewletan tê bikaranîn. Mirov dikare mînakeke zelal a redkirina normên exlaqî di pêwendiyên di navbera dewletan de di “Diyaloga Meliyan” (5.85-113) de bibîne. Ev diyalog derbarê bûyerên sala 416 B.Z. de ye, dema ku Atînayê girava Melosê dagir kir. Nûnerên Atînayî bijartekek pêşkêşî Meliyan kir, texrîbat an teslîmbûn, û ji destpêkê ve ji wan xwastin ku serî li dadweriyê nedin lê bi tenê li xelasiya xwe bifikirin. Di gotinên nûneran de, “Em her du jî dizanin ku biryarên derbarê dadweriyê de bi tenê dema ku her du alî jî di bin heman mecbûriyetê de bin di nîqaşên mirovan de tên standin, lê gava ku aliyek hêzdartir be, ew her tiştê ku dikare bistîne distîne, û aliyê qels jî mecbûr e ku vê yekê qebûl bike” (5.89). “Di bin heman mecbûriyetê de” tê wateya di bin hêza qanûnê de, û loma girêdayîbûna bi otorîteyeke qanûndaner a hevpar (Korab-Karpowicz 2006, 234). Ji ber ku otorîteyeke bi vî rengî li ser dewletan tune ye, Atînayî angaşt dikin ku di vê rewşa bêqanûn a anarşiya navneteweyî de, tekane maf mafê aliyê hêzdartir e ku li ser aliyê qels serdest be. Ew bi awayekî eşkere maf û hêzê wekhev digirin, û hesibandinên dadweriyê ji karên derveyî derdixin.

### 1.1.2 “Diyaloga Meliyan” – Nîqaşa Realîst-Îdealîst A Yekem

Ji ber vê yekê em dikarin di gotinên Atînayiyan de piştgiriyeke xurt bo perspektîfa realîst bibînin. Lê belê ev pirs wekî xwe dimîne: Gelo heta çi radeyê realîzma wan bi nêrîna Thucydides li hev dike? Digel ku gelek beşên “Diyaloga Meliyan”, û her wiha hin beşên din ên *Dîrok*ê piştgiriya xwendineke realîstîk dikin, sekna Thucydides nikare ji beşên wiha bijarte bê fahmkirin, ji vê bêtir sekna wî divê li ser bingeha konteksta berfirehtir a pirtûka wî bê nirxandin. Ya rastî, heta “Diyaloga Meliyan” bi xwe jî gelek nêrînan pêşkêşî me dike ku li dijî hev in.

Realîzma siyasî bi gelemperî ji aliyê zanyarên PNyê ve bi îdealîzmê an lîberalîzmê re tê berawirdkirin, perspektîfeke teorîk ku li ser van tiştan disekine: normên navneteweyî, pevgirêdayîbûna di navbera dewletan de, û hevkariya navneteweyî.

“Diyaloga Melian”, ku yek ji beşên *Dîrok*a Thucydides e ku gelek caran şîrove li ser tên kirin, nîqaşa klasîk a di navbera nêrînên îdealîst û realîst de pêşkêş dike: Gelo siyaseta navneteweyî dikare li ser pergaleke exlaqî bê avakirin ku ji rêgezên dadweriyê hatiye dariştin, an ew dê tim wekî arenaya desthilat û berjewendiyên neteweyî bimîne ku li dijî hev şer dikin?

Ji bo Meliyan, ku angaştên îdealîst bi kar tînin, hilbiijartin di navbera şer û qebûlkirina teslîmbûnê ye (5.86). Ew dilawêr in û ji welatê xwe hez dikin. Ew naxwazin ku azadiya xwe ji dest bidin, û digel ku ji aliyê leşkerî ve ji Atînayiyan qelstir in, ew amade ne ku xwe biparêzin (5.100; 5.112). Ew angaştên xwe li ser bingeha daxwazeke dadweriyê ava dikin, ku bi heqaniyetê ve girê didin, û Atînayiyan wekî neheq dibînin (5.90; 5.104). Ew dîndar in û bawer dikin ku Xwedawend dê piştgiriya doza wan a heq bikin û qelsiya wan telafî bikin, û baweriyê bi hevalbendiyê tînin û difikirin ku hevalbendên wan, Spartayî, ku her wiha xizmên wan in, dê alikariya wan bikin (5.104; 5.112). Ji ber vê yekê, mirov dikare di axaftina Meliyan de hêmanên nêrîna îdealîst an lîberal destnîşan bike: baweriya ku netewe xwedî wê mafê ne ku serxwebûna siyasî tetbîq bikin, baweriya ku li hemberî hev mecbûriyetên neteweyan ên dualî hene û dê li gor van mecbûriyetan tevbigerin, û baweriya ku şerê êrîşkariyê neheq e. Digel vê yekê, tiştên ku bi Melian re tune çavkanî û pêşbînî ne. Di biryara wan a xwe-parastinê de, rêberiya wan ji aliyê delîla berdest an hesabên hişmend bêtir ji aliyê hêviyên wan ve tê kirin.

Angaşta Atînayî li ser bingeha têgihên realîst ên sereke wekî ewlehî û desthilat hatiye avakirin, û ne ji aliyê wê yekê ku dinya divê çawa be ve, lê ji aliyê wê yekê ku dinya çi ye ve tê şekilandin. Atînayî guh nadin tu axaftina exlaqî û Meliyan teşwîq dikin ku li rastiyan binêrin- yanî wan teşwîq dikin ku qelsiya xwe bizanibin, û encamên potansiyel ên biryara xwe li ber çavan bigirin, û li xelasiya xwe bifikirin (5.87; 5.101). Xuya dibe ku li pişt angaştên Atînayî mentiqeke realîst a hêzdar heye. Sekna wan, ku li ser bingeha endîşeyên ewlehî û berjewendiyan ava bûye, xuya ye ku girêdayîbûna bi rasyonelîte, têgihiştina stratejîk, û pêşbiniyê ve di nav xwe de dihewîne. Lê belê, piştî lêhûrbûneke kûr, îsbat dibe ku mentiqa wan gelekî biqisûr e. Melos, dewleteke nisbeten qelstir, tu tehdîdeke ewlehiyê ya rasteqîn ji wan re

dernaxe holê. Hilweşîna Melosê ya talî bipêşketina şerê Peloponezî naguherîne, ku Atîna dê piştî çend salan di wî şerî de têk biçe.

Di *Dîrok*ê de, Thucydides nîşan dide ku desthilat, eger bi xwînsarî û hişmendiyeke dadweriyê nehatibe kontrolkirin, arezûya nekontrolkirî ya bo bêtir desthilatê derdixe holê. Tu sînorên mentiqî ji mezinahiya împartoriyekê re tune ne. Atînayî, ku piştî fethkirina Melosê bi îhtimala navûdengî û qezencê har û dîn bûbûn, li dijî Sîcîlyayê dikevin şer. Ew qet guh nadin wê angaşta Meliyan ku hesibandinên dadweriyê talîya talî bo her kesî bifêde ne (5.90). Û, her ku Atînayî hêza xwe mezin dibînin û di dawiyê de di şer de têk diçin, îsbat dibe ku mentiqa wan a berjewendîperest di esasê xwe de ne xwedî pêşbîniyê ye.

Utopîk e ku mirov di pêwendiyên navneteweyî de guh nede rastiya desthilatê, lê bi heman awayî şaş e ku mirov tenê xwe bispêre desthilatê. Diyar dibe ku Thucydides ne aliyê îdealîzma Melian a dilsaf digire û ne jî aliyê sînîzma reqîbên wan ên Atînayî digire. Ew ji aliyekî ve fêrî me dike ku em "li hemberî xeyalên dilsaf bo siyaseta navneteweyî", û ji aliyê din ve jî "li hemberî tundrawiya xirab a din: sînîzma bêkontrol" hişyar bin (Donnelly 2000, 193). Eger mirov wî wekî realîstekî siyasî bihesibîne, realîzma wî ne *realpolîtîk*ê tîne ber çavan, ku tê de exlaqê rêzikparêz tê redkirin, û ne jî neorealîzma zanistî ya îroyîn tîne ber çavan, ku tê de pirsên exlaqî bi piranî tên paşguhkirin. Realîzma Thucydides, ku ne bêexlaq û ne jî bo exlaq xemsar e, bêtir dikare bi ya Hans Morgenthau, Raymond Aron, û realîstên din ên klasîk ên sedsala bîstem bê berawirdkirin ku, her çi qas ji pêdiviyên berjewendiya neteweyî haydar bin jî, qebûl dikin ku aktorên siyasî di qada navneteweyî ji darizandina exlaqî ne muaf in.

## 1.2 Rexneya Machiavelli Ya Ji Bo Tradîsyona Exlaqî

Îdealîzm di pêwendiyên navneteweyî de, wekî realîzmê, xwedî tradîsyoneke dirêj e. Îdealîstan, ku ji rewşa dinyayê ne dilniya ne, her tim hewl daye ku pirsa di siyasetê de "divê çi be" bibersivînin. Plato, Arîsto, û Cicero hemû îdealîstên siyasî bûn ku bawer dikirin hin nirxên exlaqî yên cîhanî hebûn ku li ser bingeha wan jiyana siyasî dikaribû bê avakirin. Cicero li ser xebatên berî xwe zêde kir û fikira

qanûneke exlaqî ya xwezayî bi pêş xist ku hem bo siyaseta navmalî û hem jî bo ya nevneteweyî dikaribû bihata tetbîqkirin. Fikrên wî derbarê dirustiya di şer de di nivîsên ramangerên xirîstiyan St. Augustine û St. Thomas hîn bêtir tên bipêşxistin. Di sedsala panzdehem a talî de, dema ku Niccolò Machiavelli ji dayik bû, ew fikir di edebiyata siyasî de hê serdest bû ku angaşt dikir siyaset, tevî pêwendiyên di navbera dewletan de, divê paqij be, û angaşt dikir ku rêbazên şer divê girêdayî standardên exlaqî bin.

Machiavelli (1469-1527) zor da vê tradîsyona exlaqî ya başbicîbûyî, ji ber vê yekê sekna xwe wekî nûjenîxwazeke siyasî destnîşan dike. Nûjeniya nêzîkbûna wî di rexneya wî ya bo fikira Rojavayê ya klasîk a siyasî de, ku di vê rexneyê de vê fikirê wekî nerastîxwaz, bi armancên pir bilind nîşan dide, û di cudakirina wî ya siyasetê ji exlaq de cî digire. Ji ber vê yekê, ew bingehên siyaseta modern li ser esaseke berjewendîperest ava dike. Di beşa panzdehem a *Prens*ê de, Machiavelli beyan dike ku di bidûrketina ji doktrînên ramangerên beriya xwe de, ew "ji ya xeyalkirî bêtir li rastiya meseleyê ya karîger" digere. Ji bo wî "rastiya karîger" tekane rastiya hêjayî lêgerînê ye. "Rastiya karîger" kurteya rewşên pratîk dinimîne ku ew bawer dike ev rewş bo şênkirin û hêzdarkirina hem welêt û hem jî kesan pêwîst in. Machiavelli *virtù*, şiyanewerî an çelengiyê dixe şûna *virtue*ya dêrîn (taybemendiyeke kesan a exlaqî, wekî dadwerî an bi-xwe-karîn). Wekî pêxemberekî *virtù*yê, ew soz dide ku hem netewe û hem jî kesan bigihîne navdarî û desthilata dinyayî.

*Machiavellianism* cûreyeke radîkal a realîzma siyasî ye ku hem bo pêwendiyên navmalî û hem jî bo yên derveyî tê sepandin. Hin caran wekî *realpolitik* tê binavkirin û doktrînek e ku pêwendiya exlaq di siyasetê de înkar dike û angaşt dike ku hemû rê û rêbaz (exlaqî û neexlaqî) bo bidestxistina armancên siyasî yên diyarkirî meşrû ne. Digel ku Machiavelli hîç biwêja *ragione di stato* an hevtaya wê ya fransî *raison d'état*ê bi kar nayne, taliya talî tiştê ku bo wî xwedî giringiyê ye tam ev e: ji endîşe û normên exlaqî bêtir, her çi ku bo dewletê bifêde ye.

Machiavelli tevgerên neexlaqî di siyasetê de rewa dîtin lê tu caran red nekir ku ew tevger xirab in. Wî di nav tekane çarçoveya exlaqê tradîsyonel de kar kir. Ev her sê peywir bûn peywirên taybet ên şopînerên wî yên sedsala nozdehem: bipêşxistina

doktrîna exlaqê cot: yek vekirî û yek taybet, birina realîzma Machiavelliî ber bi ekstremên hîn bêtir, û sepandina wê di pêwendiyên navneteweyî de. Bi angaşta “dewlet ji domandina xwe wêdetir ne xwedî tu peywiran e”, Hegel erêkirineke exlaqî nîşan da bo qayîmkirina dewletê ya berjewendiyên xwe û avantajên xwe li hemberî dewletên din (Meinecke 357). Bi vî awayî, wî baweriyên kevneşopî ên derbarê exlaq de ser û bin kirin. Başiya dewletê ji aliyê wî ve bi awayekî xirab nirxa exlaqî ya herî bilind hate şîrovekirin û, mezinkirina desthilata neteweyî wekî maf û peywira dewletê hate dîtin. Dûv re, bi referansdayîna Machiavelli, Heinrich von Treitschke eşkere kir ku dewlet desthilat e, tam ji bo ku desthilata xwe li hemberî desthilatên bi heman awayî serbixwe nîşan bide, û ku peywira dewletê ya exlaqî ya bilind xurtkirina vê desthilatê ye. Li gor wî, lihevkirinên navneteweyî bi tenê heta ku bo dewletê bifêde bin divê lidar bin. Fikira tevgera dewletê ya exlaqekî serbixwe û têgiha *realpolitik*ê bi vî awayî hatin pêşkêşkirin. Exlaqê tradîsyonel û kevneşopî hat înkarkirin û siyaseta desthilatê bi cûreyeke “bilindtir” a exlaq ve hat pêwendîdar kirin. Ev têgihên han, tevî baweriya bi raseriya çanda almanî, ew çek bûn ku dewletvanên alman bi wan, ji sedsala hejdehem heta dawiya Şerê Cîhanê Yê Duyem, polîtîkayên xwe yên dagirkirin û qirkirinê rast derxistin.

Ji ber nesîhetên wî yên bibasîret bo pêşewayan (ku bû sebeb Machiavelli wekî hostayê damezirîner ê stratejiya siyaseta modern were qebûlkirin) û ji ber terefdariya wî ya bo forma dewletê ya komarxwaz, pirî caran pesnê Machiavelli tê dayîn. Teqez gelek aliyên fikira wî hene ku pesndayîneke bi vî rengî heq dikin. Digel vê yekê, mimkin e ku mirov wî wekî ramangerekî bifikire ku berpirsiyariya herî mezin bo demoralîzasyona Ewrûpayê li ser wî ye. Angaşta nûnerên Atînayî ku di “Diyaloga Meliyan” a Thucydides de hatiye pêşkêşkirin, angaşta Thrasymachus di *Dewlet*a Platon de, an angaşta Carneades, ku Cicero referans didê- ev hemû zorê didin nêrînên dêrîn û xirîstiyan ên yekîtiya siyaset û exlaqê. Lê belê, berî Machiavelli, ev cûreya hizirînê ya neexlaqî an xemsar bo exlaq tu carî di fikira Rojavayê ya sereke de nebûbû serdest. Hêz û minasibiya demî ya rastderxistina wî ya berêxwedana xirabiyê wekî rê û rêbazeke meşrû bo bidestxistina armancên siyasî bû ku gelek ji ramanger û sepînerên siyasî, ku ew şopand, qanih kirin. Bandorên fikirên Machiavelliî, wekî fikira ku angaşt dike sepandina hemû rê û rêbazên gengaz di şer de rewa ye, dê li

qadên şer ên Ewrûpaya modern bihatana dîtin ku di wir de artêşên hemwelatiyan ên mezin bê rehm û bêyî ku rêgezên exlaq xema wan be li dijî hev şer dikirin. Rageşiya di navbera minasibî û exlaq de di nav kada siyasetê de derbasdariya xwe ji dest da. Têgiha exlaqekî cot, ku zirareke hîn bêtir da exlaqê kevneşopî hate avakirin. Doktrîna *raison d'état*ê taliya talî bû sedema siyaseta *Lebensraum*ê, her du şerên cîhanê û Holocaustê.

Mihtemelen pirsgirêka herî mezin a realîzmê di pêwendiyên navneteweyî de ev e: meyldar e ku veguheze versiyona xwe ya ekstrem, ku her çi polîtîka, bo dewletên din bizirar jî be, bo dewletê bifêde be wê polîtîkayê dipejirîne her çend ew polîtîka ji aliyê exlaqî ve bikêşe be jî. Her çi qas ew pirsên exlaqî neynin zimên jî, di xebatên Waltz û gelekên din ji neorealîstên îroyîn de, exlaqekî cot, vekirî û taybet tê nîşankirin, û peyvên mîna *realpolitik*ê êdî ne xwedî wan tedaiyên neyînî ne ku bo realîstên klasîk ên wekî Hans Morgenthau xwedî van tedaiyan bûn.

## 1.3 Rewşa Xwezayê Ya Anarşîk A Hobbes

Thomas Hobbes (1588-1683) tevkarekî bizaveke rewşenbîrî bû ku armanca wê azadkirina zanista modern a ku pêş diket ji bendên mîrateya klasîk û skolastîk. Li gor felsefeya siyasî ya klasîk, ku perspektîfa îdealîst li ser bingeha wê ava bûye, mirov dikarin arezûyên xwe bi aqilê xwe kontrol bikin û dikarin bo başiya yên din bixebitin, tevî ku ev li dijî başiya wan be jî. Ji ber vê yekê, ew aktorên hem rasyonel hem jî exlaqî ne ku dişên ferqa di navbera rast û şaş de ji hev derxin û dişên hilbijartinên exlaqî bikin. Her wiha ew bi awayekî xwezayî sosyal in. Bi şarezatî, Hobbes êrîşî van nêrînan dike. Mirovên wî, ku ji exlaqî û sosyal bêtir, bi tundî takekesî ne, di bin bandora vê arezûyê de ne: "arezûyeke desthilat li pey desthilatê ya hetahetayî û bêsekn ku bi tenê di kêliya mirinê de disekine" (*Leviathan* XI 2). Ji ber hindê, ew bi awayekî misoger bo desthilatê têdikoşin. Di pêşkêşkirina fikirên bi vî rengî de, Hobbes tevkariya hin têgihên bingehîn dike, ku ji bo tradîsyonal realîst di pêwendiyên navneteweyî de, û bi taybetî ji bo neorealîzmê esasî ne. Ev di nav xwe de têgihên wiha dihewîne: karakterîzasyona xwezaya mirov wekî xweperest, têgiha anarşiya nevneteweyî, û nêrîna ku angaşt dike siyaset, ku li ser bingeha têkoşîna bo

desthilatê ava bûye, dikare bê rasyonelîzekirin û bi aweyekî zanistî mirov dikarin li serê xebatan bikin.

Yek ji têgihên Hobbesî ku pir tên zanîn ev e: rewşa xwezayê ya anarşîk, wekî ku di nav xwe de rewşeke şer bihewîne tê dîtin- û "şerekî bi vî rengî mîna şerekî wiha ye: her kes li dijî her kesî" (XII 8). Ew têgiha xwe ya rewşa şer ji nêrînên xwe yên hem xwezaya mirov û hem jî hawirdora ku kes tê de dijîn didarêje. Ji ber ku di rewşa xwezayê de tu hikûmet tune ye û her kes xwedî statuya wekhev e, mafê her kesî bo her tiştî heye; yanî li ser tevgera kesekî tu sînordarkirin tune ne. Her kes dikare di her wextî de hêzê bi kar bîne, û hemû divê her tim amade bin ku li hemberî vê hêzê bi hêz li dij derkevin. Loma, ji ber ku bi çavbirçîtiyê hatine handan, tu sînordakirinên exlaqî li ser wan tune ne, û handayî ne ku bo çavkaniyên kêm şer bikin, kes meyldar in bo qezencê "êrîşî hev bikin". Ji ber ku ji hev şikdar in û bi tirsê handayî ne, ew her wiha meyldar in ku bikevin nav tevgerên parêziyê û da ku ewlehiya xwe misoger bikin meyldar in ku êrîşî hev bikin. Herî dawî, kes her wiha bi serbilindî û arezûyeke bo navûdengiyê handayî ne. Çi bo qezencê, çi ji bo ewlehiyê an çi ji bo navdariyê be, kesên ku li pey desthilatê ne dê ji ber vê yekê "hewl bidin ku hevdu birûxînin an bindest bikin" (XIII 3). Di hawirdorên bi vî rengî nediyar de ku her kes êrîşkarekî potansiyel e, şerkirina li dijî yên din ji tevgera aştîxwaz stratejiyeke biavantajtir e, û mirov divê hîn bibe ku serdestiya li ser ên din bo zindîmayîna mirov a domdar pêwîst e.

Hobbes bi piranî li ser pêwendiya di navbera kesan û dewletê de hûr dibe, û şîroveyên wî yên li ser pêwendiyên di navbera dewletan de kêm in. Digel vê yekê, mirov dikare tiştê ku ew derbarê jiyanên kesan di rewşa xwezayê de dibêje her wiha wekî pênaseyeke vê yekê şîrove bike: çawa dewlet li gel pêwendiya di navbera hev de dijîn. Dema ku dewlet tên avakirin, ajoya şexsî bo desthilatê dibe bingeha tevgera dewletê, ku pirî caran xwe di hewlên wan ên bindestkirina dewlet û mirovên din de dide xuya kirin. Hobbes wiha dinivîse: dewlet "bo ewlehiya xwe, bi hemû hincetên xetereyê û tirsa dagirkirinê an alikariya ku dibe ku bo dagirkeran bê dayîn serweriyên xwe berfirehtir dikin, [û] da ku cîranên xwe qels bikin û bindest bikin heta ku ji destê wan tê hewl didin" (XIX 4). Manendî vê yekê, lêgerîn û hewldana

bo desthilatê di navenda vîzyona Hobbesî ya pêwendiyên di navbera dewletan de ye. Heman tişt pişt re bo modela pêwendiyên navneteweyî ya ku ji aliyê Hans Morgenthau ve hat bipêşxistin jî lidar bû ku Hans Morgenthau bi awayekî kûr di bin bandora Hobbes de mabû û heman nêrîna xwezaya mirov pejirandibû. Bi awayekî manend, neorealîst Kenneth Waltz di rêya Hobbes de çû ku anarşiya navneteweyî (tu serwereke berztir a hevpar li ser dewletên serwer tune ye) wekî hêmana esasî ya pêwendiyên navneteweyî didît.

Dema ku mirov serdestiya serwerekê qebûl dikin, ew ji şerê hemû li dijî hemû direvin ku Hobbes bi rewşa xwezayê ve girê dide; lê belê, ev şer hê jî diyarkera sereke ya pêwendiyên di navbera dewletan de ye. Ev nayê wê wateyê ku dewlet her tim şer dikin, lê ji vê bêtir tê wê wateyê ku meyleke wan a şer heye (XIII 8). Dema ku her dewlet bi bikaranîn an bikarnenanîna hêzê bo xwe biryarê distîne, di her demê de mimkin e ku şer derkeve. Bi rêya avakirina dewletekê bidestxistina ewlehiya navmalî dûv re bi rewşeke bêewlehiya navdewletî ve dibe paralel. Mirov dikare angaşt bike ku ger Hobbes bi temamî hevgirtî bûya, wî dê her wiha ev nêrîna han bipejiranda: ji bo ku ji vê rewşê birevin, dewlet divê peymanekê deynin û xwe bi serwereke cîhanî ve girê bidin. Digel ku fikira dewleteke cîhanî dê di nav hin realîstên îroyîn de piştgirî bidîta, ev ne seknek e ku Hobbes bi xwe girt. Ew pêşniyar nake ku peymaneke civakî di navbera dewletan de bê sepandin da ku anarşiya navneteweyî bi dawî bibe. Ev ji ber vê yekê ye ku rewşa bêewlehiyê, ku dewlet tê de bi cî dibin, îllehîm nabe sedema bêewlehiya hemwelatiyên wan. Heta ku şerekî çekdarî an cûreyeke din a dijminahiyê di navbera dewletan de dernekeve holê, mirovên di nav dewletekê de nisbeten dikarin xwe ewle hîs bikin.

Înkarkirina hebûna rêgez û normên exlaqî yên cîhanî di pêwendiyên di navbera dewletan de Hobbes nêzîkî Machiavelliiyan û şopînerên doktrîna *raison d'état*ê dike. Teoriya wî ya pêwendiyên navneteweyî, ku wiha dihesibîne ku dewletên serbixwe, her wekî mirovên serbixwe, bi awayekî xwezayî dijmin, asosyal û ezperest in û teoriya wî ya pêwendiyên navneteweyî wiha dihesibîne ku ji bo vîzyona îdealîst a siyasî, ku li ser bingeha civakparêziya mirov ava bûye, û têgiha dadnasiya navneteweyî, ku li ser vê vîzyonê ava bûye, dijwariyeke mezin e ku tu sînordarkirineke exlaqî li

ser tevgerê tune ye. Lê belê, tiştê ku Hobbes ji Machiavelli cuda dike û wî bêtir bi realîzma klasîk ve girê dide pêdagiriya wî ye ku li ser karaktera berevan a polîtîkaya biyanî ye. Teoriya wî ya siyasî wê pêşniyarê pêşkêş nake ku her çi bo dewletê bifêde be divê bê kirin. Nêzîkbûna wî ya pêwendiyên navneteweyî bibasîret û aştîxwaz e: dewletên serbixwe, wekî mirovan, divê ber bi aştiyê ve meyldar bin ku ji aliyê aqilmendiyê ve pesnê wê tê dayîn.

Tiştê ku hin caran bala Waltz û xwînerên neorealîst ên berhemên Hobbes lê nakeve ev e ku ew anarşiya navneteweyî wekî hawirdoreke bêrêzik nabîne. Hobbes pêşniyar dike ku hin rêgezên aqilmendiyê heta di rewşa xwezayê de jî lidar in û bi vê pêşniyarê ew tesdîq dike ku pêwendiyên navneteweyî yên aştîxwaztir û hevkarîxwaztir gengaz in. Ne jî ew hebûna qanûna navneteweyî înkar dike. Dewletên serbixwe ji bo ku ji pêwendiyên xwe re bingeheke qanûnî deynin dikarin bi hev re peymanan deynin. Lê di heman demê de, xuya ye haya Hobbes jê heye ku rêzikên navneteweyî di rêlibergirtina pîkola bo desthilatê de pirî caran dê nekarîger bin. Dewlet dê wan li gor berjewendiya xwe şîrove bikin, û yanî li gor berjwendiyên dewletên ku bandorê jê digirin dê guh li qanûna neteweyî bê dayîn an ew dê bê paşguhkirin. Ji ber hindê, pêwendiyên navneteweyî dê tim têkileyeke metirsîdar be. Ev nêrîna reşbîn a siyaseta cîhanî di navenda realîzma Hobbes de ye.

## 2. Realîzma Klasîk A Sedsala Bîstem

Realîzma sedsala bîstem wekî bertekeke li perspektîfa îdealîst derket holê ku ev perspektîf piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn di qada zanista pêwendiyên navneteweyî de serdest bû. Ev armanca îdealîstên salên 1920î û 1930î (her wiha wekî enternasyonalîstên lîberal an jî wekî utopîst tên binavkirin) hebû: avakirina aştiyê da ku rê li ber şerekî cîhanî yê din bê girtin. Wan afirandina pergaleke rêzdar a qanûna navneteweyî ku ji aliyê saziyên navneteweyî tê piştgirîkirin, wekî çareseriya pirsgirêkên di navbera dewletan de dît. Ev îdealîzma di navbera maweya her du şeran de, di sala 1920î de bû sedema damezirandina Komeleya Neteweyan û Pakta Kellog-Briand a sala 1928an ku şer qedexe kir û çareserkirina aştîxwaz a nakokiyan

gengaz kir. Serokkomarê Amerîkayê Woodrow Wilson, zanyarên wekî Norman Angell, Alfred Zimmern, û Raymond B. Fosdick, û îdealîstên navdar ên vê serdemê yên din, piştgiriya xwe ya rewşenbirî dan Komeleya Neteweyan. Ji dêvla lêhûrbûna li ser wî tiştê ku ji aliyê hinekan ve dikare wekî misogeriya şerê di navbera dewletan de û misogeriya şerê di navbera mirovan de bê dîtin, wan hilbijart ku li ser wan berjewendiyên hevpar bisekinin ku dikarin mirovahiyê li hev bicivînin, û hewl dan ku berê xwe bidin aqilmendî û exlaq. Ji bo wan, eslê şer ji xwezayeke mirov a xweperest nayê, lê ji vê yekê bêtir eslê şer ji rewşên civakî yên netekûz û pergalên siyasî tê, ku dikaribûn bên başkirin. Lê fikirên wan jixwe hê di destpêka salên 1930î de ji aliyê Reinhold Niebuhr ve û piştî çend salan jî ji aliyê E. H. Carr ve dihatin rexnekirin. Komeleya Neteweyan, ku Amerîka tu carî tev lê nebû, û ku Japonya û Almanya jê vekişiyan, nikaribû rê li ber Şerê Cîhanê Yê Duyemîn bigirta. Vê rastiyê, mihtemelen ji her angaşteke teorîk zêdetir, tevkariya bipêşxistina teoriya realîst kir. Digel ku Neteweyên Yekbûyî, ku di sala 1945an de hat avakirin, hê jî dikare wekî berhemeke ramana îdealîst a siyasî bê dîtin, zanista pêwendiyên navneteweyî di salên destpêkê yên maweya piştî şer de bi awayekî kûr ji xebatên realîstên "klasîk" ên wekî John H. Herz, Hans Morgenthau, George Kennan, û Raymond Aron bandor girtibû. Dûv re, di salên 1950 û 1960î de, zanyarên ku hewl didan nêzîkbûneke bêtir zanistî bînin xebatên siyaseta navneteweyî zor dan realîzma klasîk. Di salên 1980î de realîzma klasîk di teoriya pêwendiyên navneteweyî de rê li ber bizaveke din vekir- neorealîzm.

Ji ber ku di çarçoveya vê gotarê de ne mimkin e ku mirov behsa wan hemû ramangeran bike ku tevkariya bipêşxistina realîzma klasîk a sedsala bîstem kirine, E. H. Carr û Hans Morgenthau, lewra mihtemelen ew di nav wan de yên herî bandordar in, li vir bo nîqaşê hatine hilbijartin.

## 2.1 Zordana E. H. Carr Ji Bo Îdealîzma Utopîk

Di xebata xwe ya sereke ya li ser pêwendiyên navneteweyî de, *Qeyrana Bîst Salan*, ku cara yekem di Tebaxa 1939an de çap bû, Edwart Hallet Carr (1892-1982) êrîşî sekna îdealîst dike, ku ew wê wekî "utopîzm"ê pênase dike. Ew vê seknê

wiha karakterîze dike ku ev sekn di nav xwe de van tiştan dihewîne: baweriya bi aqilmendiyê, baweriya bi pêşveçûnê, hişmendiyeke dirustiya exlaqî, û baweriyeke bi ahengeke berjewendiyan. Li gor îdealîstan, şer averêbûneke di maweya jiyana asayî de ye û rêya astengkirina wî ev e: perwerdekirina mirovan bo aştiyê û avakirina pergalên ewlehiya kolektîf wekî Komeleya Neteweyan an Neteweyên Yekbûyî ya îroyîn. Carr bi lêpirsîna angaşta îdealîzmê ya "unîversalîzm"a exlaqî û fikira wê ya ahenga berjwendiyan êrîşî îdealîzmê dike. Ew eşkere dike ku "exlaq tenê dikare nisbî be, ne cîhanî" (19), û dibêje ku doktrîna ahenga berjewendiyan ji aliyê komên biîmtiyaz ve "ji bo rastderxistin û parastina statuya xwe ya serdest" tê bikaranîn (75).

Carr têgiha îzafiyeta fikirê bi kar tîne, ku ew vê yekê bi Marx û teorîsyenên modern ên din ve girê dide, ji bo ku nîşan bide ku standardên ku polîtîka pê tên darizandin berhemên rewş û berjewendiyan in. Fikira wî ya navendî ev e ku her tim berjewendiyên partiyekê wî tiştî diyar dike ku ev partî wekî rêgezên exlaqî dibîne û ji ber vê yekê ev rêgez ne cîhanî ne. Carr çavdêriyê dike ku siyasetmedar, wekî mînak, pirî caran zimanê dadweriyê ji bo van tiştan bi kar tînin: veşartina berjewendiyên welatê xwe yên taybet an jî ji bo ku îmajên neyînî li ser mirovên din biafirînin da ku tevgerên êrîşkariyê rast derxin. Ew nîqaş dike ku hebûna mînakên wiha yên ji aliyê exlaqî ve şermezarkirina dijmineke potansiyel an ji aliyê exlaqî ve rastderxistina sekna mirovan nîşan dide ku fikirên exlaqî ji polîtîkayên heyî tên dariştin. Polîtîka, wekî ku îdealîst nîşan didan, li ser bingeha hin normên cîhanî ava nabin ku ji berjewendiyên partiyên ku tê de ne serbixwe ne.

Angaşta Carr wiha dibêje: Eger standardên exlaqî yên taybet bi awayekî defakto li ser berjewendiyan ava bibin, her wiha hin berjewendî hene ku wî tiştî diyar dikin ku wekî rêgezên mitleq an nirxên exlaqî yên cîhanî tên dîtin. Digel ku îdealîst meyldar in ku nirxên bi vî rengî, wekî aştî an dadwerî, wekî cîhanî bibînin û angaşt dikin ku parastina wan di berjewendiya hemûyan de ye, Carr xwedî angaştên li dijî vê nerînê ye. Li gor wî, ne nirxên cîhanî û ne jî berjewendiyên cîhanî hene. Ew angaşt dike ku ew ên ku behsa berjewendiyên cîhanî dikin di eslê xwe de li gor berjewendiyên xwe tevdigerin (71). Ew difikirin ku tiştê ku bo wan baş e, ji bo her kesî baş e, û

berjewendiyên xwe bi berjewendiya cîhanî ya tevahiya dinyayê ve girê didin.

Têgiha îdealîst a *ahenga berjewendiyan* li ser bingeha vê nêrînê ava bûye: mirov dikarin bi awayekî aqilmend têbigihên ku hin berjewendiyên wan ên hevpar hene, û ji ber vê yekê jî hevkarî gengaz e. Carr bi rastiya *pevçûna berjewendiyan* li dijî vê fikirê derdikeve. Li gor wî, dinya bi berjewendiyên taybet ên kom û kesên cuda ji hev veqetiyaye. Di hawirdoreke wiha şerûd de, pergal li ser bingeha desthilatê ava dibe, ne li ser bingeha exlaq. Her wiha, exlaq bi xwe berhema desthilatê ye (61). Wekî Hobbes, Carr exlaqê wiha dibîne: tiştekî ku ji aliyê pergala qanûnî ya taybet ve dameriziye ku ji aliyê desthilateke zordar ve tê empozekirin. Normên exlaqî yên navneteweyî li ser welatên din ji aliyê neteweyên serdest an wan komên neteweyan ve ku xwe wekî komeleya navneteweyî ya tevahî pêşkêş dikin tên empozekirin. Ev norm ji bo domandina serdestiya wan neteweyan tên çêkirin.

Nirxên ku îdealîst wekî bo hemû kesan baş dibînin, mîna aştî, dadweriya civakî, refah, û tertîba navneteweyî, ji aliyê Carr ve wekî nêrînên bi tenê *status quo* tên dîtin. Desthilatên ku bi status quoyê qayîl in pergala heyî wekî adil dibînin û ji ber vê yekê aştiyê nesîhet dikin. Ew hewl didin ku her kesî li dor fikira xwe ya wê yekê ku çi baş e bicivînin. “Her wekî ku di komeleyekê de çîna rêvebir ji bo aştiya navmalî dua dikin, ku ewlehî û serdestiya wê misoger dike, … yanî aştiya navneteweyî dibe berjwendiyeke desthilatên serdest a taybet a bicîbûyî” (76). Ji aliyê din ve, desthilatên neqayîl heman pergalê wekî neadil dibînin û bi vî awayî amadekariya şer dikin. Ji ber vê yekê, rêya bidestxistina aştiyê, ger ku bi hêsanî nikare bê qayîmkirin, qayîlkirina desthilatên neqayîl e. “Ew ên ku herî pir ew ji tertîbê (ya navneteweyî) sûdê werdigirin ji bo ku wê bo ew ên ku herî kêm ew jê sûdê werdigirin qayilbartir bikin, taliya talî bi tenê dikarin hêvî bikin ku bi guherînên kafî wê biparêzin” (152). Encama mentiqî ya ku xwînerê/a pirtûka Carr divê bigihê polîtîkaya aşkirinê ye.

Carr ramangerekî rewşenbîr bû. Wî bi xwe pejirand ku mentiqa “realîzma xwerû ji hewleke eşkere bo desthilatê pê ve tu tiştekî pêşniyar nake ku her cûreyeke civaka navneteweyî negengaz dike” (87). Digel ku ew wî tiştî dirûxîne ku ew wî wekî “utopyaya realîzmê ya heyî” bi nav dike, ew di heman demê de hewl dide ku “utopyayeke nû”, tertîbeke cîhanî ya realîst ava bike (*heman çavkanî, r. 87*). Ji ber

vê yekê, ew qebûl dike ku mirov hewcedarî hin rêgez an baweriyên taybet ên esasî ne ku di nav çandên cuda de hevpar in, û angaşta xwe ya pêşîn tekzîb dike ku bi wê ew hewl dide ku cîhanîtiya her norm û nirxan înkar bike. Ji bo ku bêtir îtirazan li sekna xwe bike, rastiya ku, wekî ku ew angaşt dike, zimanê nirxên cîhanî di siyasetê de bo berjewendiya partiyekê dikare bê suîstîmalkirin, û ku nirxên bi vî rengî bi tenê di saziyên siyasî de bi awayekî bêqisûr dikarin bên sepandin, nayê wê wateyê ku nirxên bi vî rengî tune ne. Di dilê gelek mirovan de, hem ên biîmtiyaz û hem jî yên bêîmtiyaz, dilbîjîneke kûr bo aştî, tertîb, refah û dadweriyê heye. Meşrûiyeta îdealîzmê di hewla domdar a piştgirîdayîn û ramîna li ser van nirxan de cî digire. Ger îdealîst di hewla xwe de baş bala xwe nedin rastiya desthilatê, ew têk diçin. Ji aliyekî din ve, di cîhana "realîzma xwerû" de, ku tê de hemû nirx li gor berjewendiyan tên darizandin, jiyan ji lîstikeke desthilatê pê ve nabe tiştekî din û dibe tiştekî ku nayê tehemilkirin.

*Qeyrana Bîst Salan* behsa gelek fikirên cîhanî dike, lê ew her wiha *zeitgeist*a zemanê xwe jî nîşan dide. Digel ku em dikarin îdealîstên di navbera maweya her du şeran de ji ber vê rexne bikin: ji ber bêqabiliyetiya wan a avakirina saziyên navneteweyî yên têra xwe xurt heta ku dikaribûna rê li ber Şerê Cîhanê Yê Duyemîn bigirtana, ev pirtûk nîşan dide ku realîstên di navbera maweya her du şeran de bi heman awayî bo vê dijwariyê ne amade bûn. Carr gelek caran wekî ku ew mîna her welatekî din be behsa Almanyaya di bin hukmê Naziyan de dike. Ew dibêje ku ger Almanya êdî ne desthilateke neqayîl bûya û "li Ewrûpayê bibûya serdest," wî dê zimanekî hevgirtina navneteweyî wekî yê desthilatên Ewrûpayê yên din bi kar bianiya (79). Bêqabiliyetiya Carr û realîstên din a têgihiştina xwezaya Nazîzmê ya xeternak, û baweriya wan a bi vê yekê: Almanya dê bi pêveberdanên erdîn qayîl bibûya, kir ku hawirdoreke siyasî qayîm bibe ku tê de Almanya hêzdartir bû, wê Çekoslovakya li gor daxwaza xwe îlhaq kir û di Îlona 1939an de bi tenê Polonya bi awayekî leşkerî li dijî wê derket.

Teoriyeke pêwendiyên navneteweyî ne tenê teşebiseke rewşenbîrî ye, derencamên wê yên pratîk hene. Ew bandorê li ser fikirîna me û pratîka me ya siyasî dike. Ji aliyê pratîk ve, realîstên salên 1930î, ku Carr piştgiriyeke rewşenbîrî

da wan, ew mirov bûn ku li dijî pergala ewlehiya kolektîf bûn ku di Komeleya Neteweyan de cî digirt. Bi xebatên di nav saziyên polîtîkaya derveyî ya roja xwe de, wan tevkariya qelsiya Komeleya Neteweyan kir. Piştî ku wan Komele qels kir, wekî alternatîfeke bo ewlehiya kolektîf wan bi Almanyayê re da pey polîtîkayeke aşkirin û pêveberdanê (Ashworth 46). Piştî îlhaqkirina Çekoslovakyayê, dema ku têkçûna realîstên mihafezekar ên dij-Komele ku li dora Neville Chamberlain civiyabûn û têkçûna vê polîtîkayê eşkere bû, wan hewl da ku wê pergala ewlehiyê ji nû ve ava bikin ku wan berê rûxandibû. Wan ên ku piştgirî dan ewlehiya kolektîf wekî îdealîst hatin binavkirin.

## 2.2 Rêgezên Hans Morgenthau Yên Realîst

Hans J. Morgenthau (1904-1980) realîzm bi pêş xist û ew veguherand teoriyeke pêwendiyên navneteweyî ya berfireh. Bi bandora ku wî ji teologê protestan û nivîskarê siyasî Reinhold Niebuhr, her wiha ji Hobbes, girt, ew ezperestî û arezûya desthilatê di navenda teswîra xwe ya hebûna mirov de bi cî dike. Arezûya mirov a bêtetmîn a bo ya bêzeman û cîhanî, ku ew bi *animus domandi*yê ve girê dide, arezûya serdestbûnê, ji bo wî sedema pevçûnê ya sereke ye. Wekî ku ew di xebata xwe ya sereke *Siyaset Di Nava Neteweyan De: Hewla Bo Desthilat Û Aştiyê* de dibêje, ku cara yekem di sala 1948an de çap bû, "siyaseta navneteweyî, wekî hemû siyasetan, hewleke bo desthilatê ye" (25).

Morgenthau realîzmê di pêwendiyên navneteweyî de sîstematîze dike li ser bingeha 6 rêgezên ku ew di çapa duyem a *Siyaset Di Nava Neteweyan De* behs dike. Wekî kevneşoperestekî, ew li dijî wan qaşo zanyaran derdikeve (zanyarên ku, bi taybetî di salên 1950î de, hewl dan zanista pêwendiyên navneteweyî daxin asta şaxeke zanista reftarî). Lê dîsa jî, ew di rêgeza yekem de dibêje ku realîzm li ser bingeha qanûnên objektîf ava bûye ku rehên wan digihên xwezaya mirov a neguherbar (4). Ew dixwaze realîzmê bi pêş bixe û wê veguherîne hem teoriyeke siyaseta navneteweyî û hem jî hunereke siyasî ku bo polîtîkaya derveyî amûreke bikêr e.

Hîma teoriya Morgenthau ya realîst *têgiha desthilatê* an "têgiha berjewendiya

ku li gor desthilatê tê pênasekirin” e, ku rêgeza wî ya duyem dişekilîne: baweriya ku pêşewayên siyasî “li gor berjewendiya ku wekî desthilat tê pênasekirin difikirin û tevdigerin” (5). Ev têgih otonomiya siyasetê pênase dike û digel armanc, tercîhên cuda û taybetmendiyên rewşenbîrî û exlaqî yên siyasetmedaran rê li ber analîza polîtîkaya derveyî vedike. Her wiha, ev esasa sêwirandineke siyasetê ya rasyonel e.

Digel ku, wekî ku Morgenthau di rêgeza sêyem de rave dike, berjewendiya ku wekî desthilat tê pênasekirin kategoriyeke bi awayekî cîhanî lidar e, û ya rastî hêmaneke siyasetê ya bingehîn e, gelek tişt di zeman û rewşên cuda de dikarin bi berjewendî an desthilatê ve bên girêdan. Naveroka wê û awayê bikaranîna wê ji aliyê hawirdora siyasî û çandî ve tên diyarkirin.

Di rêgeza çarem de, Morgenthau li ser têkiliya di navbera realîzm û exlaq de hûr dibe. Ew dibêje ku digel ku realîst ji giringiya exlaqî ya tevgera siyasî haydar in, ew her wiha ji rageşiya di navbera exlaq û pêwîstiyên tevgera siyasî ya serkeftî de jî haydar in. Ew dibêje ku “Rêgezên exlaqî yên cîhanî nikarin li ser tevgerên dewletan di formulasyona xwe ya razber a cîhanî de bên sepandin, lê …ew divê bi fîltreyeke rewşên şênber ên dem û mekanê bên parzûnandin” (9). Ev rêgez divê bi basîretê bên piştgirîkirin lewra ew agahdar dike ku “tu exlaqekî siyasî bê basîretê çênabe; yanî, bêyî hesibandina encamên siyasî yên tevgera ku bi xuyayî eşkere exlaqî ye” (*heman çavkanî.*).

Basîret, qabiliyeta darizandina dirustiya tevgerekê ji nav alternatîfên gengaz li ser bingeha encamên wê yên siyasî yên mihtemel, divê rêberiya biryarên siyasî bike, ne baweriya bi serdestiya mirov a exlaqî an îdeolojîk. Ev di rêgeza pêncem de tê dupatkirin ku li vir Morgenthau cardin li ser vê fikirê disekine: divê li hemû aktorên dewletê, tevî yên me bi xwe, bi tenê wiha bê nêrîn: wekî hebûnên ku li pey berjewendiyên xwe yên taybet in ku li gor desthilatê tên penasekirin. Di pêwendiyên xwe yên bi hevtayên xwe re bi vê seknê, û bi vî awayî bi xwevedizîna ji pevçûna îdeolojîk, dewletek dê karibe li pey wan polîtîkayan bikeve ku qedrê berjewendiyên dewletên din digirin û di heman demê de dê berjewendiyên xwe jî biparêze û qayîm bike.

Heta ku desthilat, an berjewendiya ku wekî desthilat tê pênasekirin, ew têgih be

ku siyasetê pênase dike, siyaset dê kadeke xweser be, wekî ku Morgenthau di rêgeza xwe ya realîzmê ya şeşem de diyar dike. Nabe ku siyaset bi tenê girêdayî exlaq be. Lê belê, exlaq di siyasetê de rolekê dilîze. " Mirovekî ku ji 'mirovekî siyasî' pê ve ne tu tiştekî din e, dê bibe cinawirek, ji ber ku dê tu sînorên exlaqî jê re tune bin. Mirovekî ku ji 'mirovekî exlaqî' pê ve ne tu tiştekî din e, dê bibe ehmeqek ji ber ku dê tu basîret pê re tune be" (12). Hunera siyasî pêwîst dike ku giringî bi van her du rehendên jiyana mirov, desthilat û exlaq, bê dayîn.

Digel ku di 6 rêgezên Morgenthau yên realîzmê de dubare û hevnegirî hene, dîsa jî em dikarin vê sêwirê ji wan bigirin: Desthilat an berjewendî têgiha navendî ye ku siyasetê vediguherîne qadeke xweser. Aktorên dewletê yên rasyonel li pey berjewendiyên xwe yên neteweyî ne. Ji ber vê yekê, teoriyeke rasyonel a siyaseta navneteweyî dikare bê bipêşxistin.

Teoriyeke bi vî rengî bi exlaq, baweriyên dînî, armanc, tercîhên îdeolojîk ên pêşewayên siyasî re eleqedar nabe. Teoriyeke bi vî rengî her wiha nîşan dide ku ji bo ku xwe ji pevçûnan vedizin, dewlet divê xwe ji mîsyonên exlaqî an pevçûnên îdeolojîk dûr bixin û li pey wan lihevkirinan bikevin ku bi tenê li ser bingeha tetmînkirina berjewendiyên wan ên dualî ava bûne.

Tevî ku ew siyasetê wekî kadeke xweser pênase dike, Morgenthau exlaqê ji siyasetê cuda nake. Tevgera mirov a parastina welatê xwe ji bo wî xwedî giringiyeke exlaqî ya kûr e. Taliya talî lewra ev ji ber armanca zindîmayîna neteweyî ye, ev tevger di nav xwe de basîretê dihewîne ku bi hilbijartina tevgera herî baş ve pêwendîdar e. Di halê şerekî navneteweyî yê çekdarî de parastina karîger a jiyana mirovan ji zerarê bi tenê ne tevgereke fîzîkî ya xurt e; ev her wiha xwedî rehendên bibasîret û exlaqî ye.

Morgenthau li realîzmê wekî awayekî hizirîna derbarê pêwendiyên navneteweyî de û wekî amûreke bikêr bo avakirina polîtîkayan dinêre. Lê belê, hin têgihên teoriya wî yên bingehîn, û bi taybetî fikira ku sedema pevçûnê wekî xwezaya mirov dibîne, her wiha têgiha desthilatê bi xwe, hin rexne arandin.

Siyaseta navneteweyî, wekî hemû siyasetan, ji bo Morgenthau ji ber arezûya

mirov a esasî ya bo desthilatê, hewleke bo desthilatê ye. Lê nirxandina her kesî wekî ku di nav lêgerîneke hetahetayî bo desthilatê de be- nêrîna ku bi wî û Hobbes re tev de heye- pêşaneyeke gumanbar e. Xwezaya mirov bi çavdêrî û tecrubeyê nikare bê eşkerekirin. Xwezaya mirov bi tu lêkolîneke tecrubî nikare bê îsbatkirin, lê tenê bi felsefeyê dikare bê eşkerekirin, li ser mirov dikare wekî mijareke baweriyê bê empozekirin, û bi perwerdeyê dikare bê fêrkirin.

Morgenthau bi xwe baweriya bi ajoya mirov a bo desthilatê bi pêşkêşkirina aliyeke normatîf a teoriya xwe qayîm dike ku, ev jî rasyonelîte ye. Polîtîkayeke derveyî ya rasyonel wekî “polîtîkayeke derveyî ya baş” tê dîtin (7). Lê ew rasyonelîteyê wekî pêvajoyeke hesibandina berdêl û fêdeyên hemû polîtîkayên alternatîf pênase dike ku ji bo diyarkirina bikêrhatîbûna wan a nisbî, yanî qabiliyeta wan a zêdekirina desthilatê ye. Dewletvan “li gor berjewendiya ku wekî desthilatê tê pênasekirin difikirin û tevdigerin” (5). Bi tenê qelsiya çêkerên polîtîkayan a rewşenbirî dikare bibe sedema polîtîkayên derveyî ku ji rêyeke rasyonel averê dibin ku armaca vê rêyê kêmkirina rîskan û zêdekirina fêdeyan e. Ji ber vê yekê, ji dêvla pêşkêşkirina teswîreke têkiliyên mirovan a rasteqîn, Morgenthau li ser lipeyketina desthilatê û rasyonelîteya vê lipeyketinê disekine û wê wekî normekê ava dike.

Wekî ku Raymond Aron û zanyarên din lê hay bûn, desthilat, têgiha esasî ya realîzma Morgenthau, xumam e. Desthilat di siyasetê de yan dikare bibe amûrek yan jî armancek. Lê ger desthilat bi tenê amûreke bo bidestxistina tiştekî be, ew xwezaya siyaseta navneteweyî bi awayê ku Morgenthau angaşt dike pênase nake. Ew nake ku em tevgerên dewletan bi awayekî fahm bikin ku ji armanc û tercîhên îdeolojîk ên pêşewayên wan ên siyasî serbixwe ye. Ew nikare bibe bingeha pênasekirina siyasetê wekî kadeke xweser. Ji ber vê yekê rêgezên Morgenthau ên realîzmê gumanbar in. Aron dipirse, “gelo ev rast e ku dewlet, rejîma wan her çi be jî, li pey heman polîtîkaya derveyî dikevin” (597) û ku polîtîkayên derveyî yên Napoleon an Stalin esasen dişibin ên Hitler, Louis XVI an Nicholas II, ku ji hewla bo desthilatê pê ve ne tiştekî din e? “Eger bersiva mirov erê be, naxwe pêşniyaz nikare bê înkarkirin, lê ne pir hînker e” (598). Ji ber hindê, bêfêde ye ku mirov tevgerên dewletan tenê bi referansa desthilat, ewlehî an berjewendiya neteweyî pênase bike. Bêyî konteksta

dîrokî û çandî ya berfirehtir, xebat li ser siyaseta navneteweyî nikarin bên kirin.

Carr û Morgenthau bi awayekî sereke li ser pêwendiyên navneteweyî hûr dibin. Lê belê, realîzma wan a siyasî her wiha dikare li ser siyaseta navmalî jî bê sepandin. Bûyîna realîstekî/e klasîk bi gelemperî tê wê wateyê ku mirov siyasetê wekî şerekî berjewendiyan û hewleke bo desthilatê bibîne û her wiha tê wê wateyê ku mirov ji dêvla angaştên exlaqî bi pejirandina berjewendiyên hevpar li aştiyê bigere. Bernard Williams û Raymond Geuss, nûnerên bandordar ên realîzma siyasî ya nû, bizavek di teoriya siyasî ya hevçerx de, wî tiştî rexne dikin ku ew wî wekî "moralîzma siyasî" pênase dikin û li ser otonomiya siyasetê ya li hemberî exlaq disekinin. Lê, realîzma teoriya siyasî û realîzma pêwendiyên navneteweyî wekî du bernameyên lêkolînê yên cuda xuya dikin. Wekî ku ji aliyê çendîn zanyaran ve jî hatiye diyarkirin (William Scheuerman, Alison McQueen, Terry Nardin, Duncan Bell), ew ên ku tevkariya realîzma di teoriya siyasî de dikin kêm giringiyê didin ew ên ku li ser realîzma di siyaseta navneteweyî de dixebitin.

## 3. Neorealîzm

Digel xumamî û qelsiya wê, berhema Morgenthau ya bi navê *Siyaset Di Nava Neteweyan De* bû pirtûkeke dersê ya standard û bo nifşekî filan bandor li ser fikirîna derbarê siyaseta navneteweyî de kir. Di heman demê de, hewlek hebû ku nêzîkbûneke bipêşxistina teoriyan ên derbarê pêwendiyên navneteweyî de bê çêkirin ku bi awayekî metodolojîk ev nêzîkbûn hişktir be. Di salên 1950î û 1960î de gelek zanyarên ji qadên cuda ketin nav zanista Pêwendiyên Navneteweyî û hewl dan ku li şûna "edebiyata aqilmendiyê" ya realîstên klasîk, têgihên zanistî û aqilmendî bi cî bikin (Brown 35). Vê yekê êrîşeke dij arand ku ji aliyê van kesan ve bû: Morgenthau û zanyarên ku girêdayî wê dibistanê bûn ku wekî Dibistana Îngilîz dihate zanîn, bi taybetî Hedley Bull, ku nêzîkbûneke tradîsyonel diparastin (Bull 1966).

Wekî encam, zanista pêwendiyên navneteweyî wekî du şaxên sereke hat dabeşkirin: tradîsyonel an ne-pozîtîvîst û zanistî an pozîtîvîst (neo-pozîtîvîst). Dûv re, şaxeke din jî: post-pozîtîvîsm lê hat zêdekirin. Tradîsyonelîst li ser pirsên

normatîf disekinin û bi dîrok, felsefe û hiqûqê mijûl dibin. Zanyar an pozîtîvîst ji dêvla yeke normatîf, li ser formeke pênasîner û raveker a lêpirsînê disekinin. Wan di qadê de bandordariyeke xurt bi dest xist. Jixwe di salên navîn ên 1960î de, piraniya xwendekarên amerîkî yên di pêwendiyên navneteweyî de di lêkolîna çendaniyî, teoriya lîstikê, û teknîkên lêkolînê yên din ên nû yên zanistên civakî de hatibûn perwerdekirin. Vê yekê, tevî hawirdora navneteweyî ya guherbar, bandoreke giring li zanista pêwendiyên navneteweyî kir.

Digel cuhadiyên wan ên metodolojîk, angaşta realîstan ew e ku dewlet di siyaseta navneteweyî de aktora sereke ye, û pêwendiyên hevrikî û hevnegirtî yên di navbera dewletan de bingeha pêwendiyên navneteweyî yên rasteqîn in. Lê belê, her ku bandora Şerê Sar di salên 1970î de kêmtir bû, mirov dikaribû giringiya aktorên din jî bidîta ku her ku diçû geştir bû: saziyên navneteweyî û ne-hikûmetî, her wiha fîrmayên pirneteweyî. Ev bipêşketin bû sedema vejîna fikirîna îdealîst, ku wekî neolîberalîzm an pluralîzm hate zanîn. Digel ku ew hin angaştên realîzmê yên bingehîn dipejirînin, pluralîstên sereke, Robert Keohane û Joseph Nye, ji bo ku vê teswîra pirtir rewşenbîr a siyaseta cîhanî pênase bikin têgiha *pevgirêdayîbûna dualî ya aloz* pêşniyar kirine. Wan angaşt dikir ku dewlet bo fêdeya dualî bi awayekî bandordar dikarin hevkariya hev bikin û di pêwendiyên navneteweyî de bipêşketinek dikare çêbibe, û ne hewce ye ku pêşeroj wekî rabirdûyê be.

## 3.1 Pergala Kenneth Waltz Ya Navneteweyî

Bersiva realîst bi awayê herî eşkere ji Kenneth N. Waltz hat ku wî realîzma di pêwendiyên navneteweyî de bi awayekî nû û diyar ji nû ve formule kir. Di pirtûka xwe ya bi navê *Teoriya Siyaseta Navneteweyî* de, ku cara yekem di sala 1979an de çap bû, wî bersiv da zordana lîberalîst û hewl da ku kêmasiyên realîzma Hans Morgenthau ya klasîk bi nêzîkbûneke pirtir zanistî, ku ev yek wekî realîzma strukturel an neorealîzm hate zanîn. Digel ku Morgenthau teoriya xwe di hewla bo desthilatê de bi cî kir, ku wî ev yek bi xwezaya mirov ve girê da, Waltz hewl da ku xwe ji her nîqaşa felsefîk a xwezaya mirov vedize, û ji dêvla vê yekê wî dest pê kir ku bi bikaranîna mîkroekonomiyê wekî model teoriyeke siyaseta navneteweyî

ava bike. Di xebatên xwe de, ew angaşt dike ku dewletên di pergala navneteweyî de wekî fîrmayên di aboriya navmalî de ne û xwedî heman berjewendiya esasî ne: zîndamayîn. “Bi awayekî nevneteweyî, hawirdora tevgerên dewletan, yan avahiya pergala wan, ji aliyê vê rastiyê ve tê diyarkirin: bo hin dewletan zindîmayîn di ser wan armancên din re ye ku dikarin zû bên bidestxistin, û ew bo bidestxistina vê yekê bi awayekî nisbeten bandordar tevdigerin” (93).

Waltz dibêje ku hem lîberalên tradîsyonelîst û hem jî realîstên klasîk heman şaşiyê dikin dema ku ew bala xwe didin her dewleta taybet û mijarên îdeolojîk, exlaqî û aborî. Ew di bipêşxistina pênaseyeke cidî ya pergala navneteweyî de bi ser nakevin: pênaseyeke ku dikare ji qada sosyo-polîtîk a berfirehtir bê cudakirin. Waltz dipejirîne ku cudakirineke bi vî rengî rastiyê serobino dike û gelek babetan jê derdixe ku bo realîzma klasîk giring bûn. Ev cudakirin rê li ber analîza bipêşxistina polîtîkayên derveyî yên taybet venake. Lê belê, fêdeya vê cudakirinê heye. Bi taybetî, ev cudakirin alikariyê dike ku diyarkerên siyaseta navneteweyî yên sereke bên fahmkirin. Bê guman, teoriya Waltz a neorealîst nikare li ser siyaseta navmalî bê sepandin. Teoriya wî nikare bo bipêşxistina polîtîkayên dewletan derbarê têkiliyên wan ên navneteweyî an navmalî de bê bikaranîn. Teoriya wî bi tenê alikariyê dike ku ev yek bê ravekirin: gelo çima dewlet digel formên xwe yên hikûmetê yên cuda û îdeolojiyên xwe yên cûrbicûr bi awayên wekhev tevdigerin, û çima, digel pevgirêdayîbûna wan a dualî ku her ku diçe mezin dibe, teswîra pêwendiyên navneteweyî ya seranser wisa xuya nake ku dê biguhere.

Li gor Waltz tevgera dewletan a wekhev a sedan salan dikare bi wan sînordariyan bê ravekirin ku ji aliyê avahiya pergala navneteweyî ve li ser tevgera wan tê empozekirin. Avahiya pergalekê ewil bi wê rêgezê tê pênasekirin ku ew pê tê sazkirin, dûv re bi cudabûna hêmanên xwe, û herî dawî jî bi belavbûna qabiliyetan (desthilatan) di navbera hêmanan de tê pênasekirin. Anarşî, an jî tunebûna otoriteya navendî, bo Waltz rêgeza sazker a pergala navneteweyî ye. Hêmanên pergala navneteweyî dewlet in. Waltz hebûna aktorên ne-dewletî dipejirîne, lê wan wekî nisbeten negiring paşguh dike. Ji ber ku hemû dewlet dixwazin zindî bimînin, û anarşî pergaleke alîkarî-bo-xwe pêwîst dike ku tê de her dewlet divê li xwe miqate

be, tu dabeşbûna kar an cudabûneke fonksiyonel di navberan wan de tune ye. Digel ku dewlet bi awayekî fonksiyonel wekhev in, ew dîsa jî bi qabiliyetên xwe yên nisbî (desthilata ku her yek ji wan dinimîne) yên bicîanîna heman fonksiyonê ji hev cuda dibin.

Wekî encam, Waltz desthilat û tevgera dewletê ji realîstên klasîk bi awayekî cuda dibîne. Bo Morgenthau desthilat hem amûrek û hem jî armancek bû, û tevgera dewletê ya rasyonel bi tenê wekî stratejiyekê dihat fahmkirin ku dê desthilata herî zêde kom bikira. Berevajî vê yekê, neorealîst angaşt dikin ku berjewendiya her dewletê ya esasî ewlehî ye û ji ber vê yekê neorealîst li ser belavkirina desthilatê disekinîn. Her wiha tiştê ku neorealîzmê ji realîzma klasîk cuda dike tundiya metodolojîk û xwe-pênasekirina zanistî ye (Guzinni 1998, 127-128). Waltz li ser vê yekê pêdagir e: gelo zanîn çi qas dikare bi awayekî tecrubî bê azmûnkirin, û ew her wiha li ser folsîfîkasyonîzmê wekî îdealeke metodolojîk pêdagir e ku, wekî ku ew bi xwe jî dipejirîne, dikare bi tenê bi awayekî sînordar di pêwendiyên navneteweyî de bê sepandin.

Belavkirina qabiliyetan di navbera dewletan de dikare biguhere; lê belê, anarşî, rêgeza sazker a pêwendiyên navneteweyî, neguhartî dimîne. Ev yek bandoreke domdar li ser tevgera wan dewletan dike ku dielimin mentiqa alîkarî-bo-xwe. Bi hewldana bo pûçkirina fikirên neolîberal ên derbarê bandorên pevgirêdayîbûna dualî de, Waltz du sedeman bo wê yekê pênase dike ku gelo çima pergala navneteweyî ya anarşîk hevkariyê sînordar dike: bêewlehî û qezencên newekhev. Di konteksta anarşiyê de, her dewlet derbarê niyetên ên din de ne piştrast e û ditirse ku qezencên mihtemel ên ku ji hevkariyê tên dikare ji bo xwe bêtir bo yên din bifêde bin û ji ber vê yekê dibe sedem ku her dewlet girêdayî yên din be. “Dewlet bi dilê xwe xwe naxin rewşên pevgirêdayîbûna zêde. Di pergaleke alîkarî-bo-xwe de, hesibandinên ewlehiyê berjewendiya siyasî ji qezenca aborî giringtir dikin.” (Waltz 1979, 107).

Ji ber çelengiya wê ya teorîk û tundiya wê ya metodolojîk, neorealîzm di zanista pêwendiyên navneteweyî de gelekî bandordar bûye. Li gor dîtina gelek zanyaran, realîzma Morgenthau wekî anakronîstîk hatiye dîtin- “qonaxeke balkêş û giring e di dîroka fikirîna derbarê vê zanistê de, bê guman, lê zêde wiha nayê dîtin ku realîzma

Morgenthau tevkariyeke cidî bo wê teoriyê kiribe ku bi awayekî tund zanistî ye” (Williams 2007, 1). Lê belê, digel ku di destpêkê de ji realîzma klasîk pirtir hate qebûlkirin, neorealîzmê her wiha ji aliyê gelek bîwaran ve rexneyên tund arandine.

## 3.2 Bervêdanên Li Dijî Neorealîzmê

Di sala 1979an de Waltz nivîsand ku di serdema nukleer de pergala navneteweyî ya ducemserî, ku li ser du hêzan ava bû- Dewletên Yekbûyî Yên Amerîkayê û Yekîtiya Sovyetê- ne tenê stabîl bû lê her wiha xuya bû ku dê bidome (176-7). Bi hilweşîna Dîwara Berlînê û piştî wê bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetê îsbat bû ku ev pêşbînî şaş e. Diyar bû ku cîhana ducemserî ji wî tiştê ku gelek analîstên realîst texmîn kiribûn xeternaktir e. Bidawîbûna vê cîhana ducemserî rê li ber derfet û zehmetiyên nû vekirin ku girêdayî cîhanîbûnê bûn. Vê yekê kir ku gelek rexnegir angaşt bikin ku neorealîzm, wekî realîzma klasîk, nikare bi awayekî kafî guhertinên di cîhana siyasî de rave bike.

Nîqaşa nû ya di navbera (neo)realîst û (neo)lîberalên navneteweyî êdî ne bi pirsên exlaq û xwezaya mirov, lê bi vê yekê eleqedar e: gelo heta çi radeyê tevgera dewletê ji sazî, hînbûn û babetên din bêtir, ku bo hevkariyê bifêde ne, ji avahiya anarşîk ya pergala navneteweyî bandorê digire. Di pirtûka xwe ya sala 1989an a bi navê *Saziyên Navneteweyî û Desthilata Dewletê*, Robert Keohane pêdagiriya Waltz dipejirîne ku li ser teoriya pergal-astê ye û her wiha ew vê pêşbiniya Waltz a gelemper qebûl dike: dewlet aktorên berjewendîperest in ku bi awayekî rasyonel li pey armancên xwe ne. Lê belê, bi sepandina teoriya lîstikê ew nîşan dide ku dewlet bi rêya hevkariya aborî û beşdarbûna di saziyên navneteweyî de dikarin feraseta berjewendiya xwe berfirehtir bikin. Şêweyên pevgirêdayîbûna dualî loma dikarin bandorê li ser siyaseta cîhanê bikin. Keohane teoriyên sîstemîk pêwîst dike ku dê babetên ku bandorê li ser hevbandoriya dewletê dikin û guhertinê, çêtir bi rê ve bibin.

Teorîsyenên rexnegir, wekî Robert W. Cox, her wiha bala xwe didin qaşo bêqabiliyetiya neolîberalîzmê ya birêvebirina guhertinê. Li gor dîtina wan, neorealîst avahiyeke pêwendiyên navneteweyî ya taybet dihebînin ku û bi awayekî dîrokî

li ser dewletê ava bûye, û ew angaşt dikin ku ev avahî bi awayekî cîhanî lidar e. Berevajî vê yekê, teorîsyenên rexnegir bawer dikin ku bi analîzkirina hevbandoriya fikiran, babetên materyal, û hêzên civakî, mirov dikare fahm bike bê ka ev avahî çawa ava bûye û ew taliya talî çawa dikare biguhere (Cox 1986). Ew angaşt dikin ku neorealîzm hem wê pêvajoyê paşguh dikin ku tê de nasname û berjewendî dirûv û teşe digirin û hem jî gengaziyên cûrbicûr paşguh dikin. Neorealîzm rewşa heyî ya pêwendiyên stratejîk ên di navbera dewletan de meşrû dike û metoda zanistî wekî tekane rêya bidestxistina zanînê dibînin. Ew pratîkekê dinimîne ku veder dike û her wiha eleqeyeke bo serdestbûn û kontrolkirinê dinimîne.

Tevî ku realîst bala xwe didin pêwendiyên navneteweyî û ewlehiya neteweyî, bala teorîsyenên rexnegir li ser ewlehiya mirov û azadiya civakê ye. Ew li ser ewlehiya civakî, aborî û hawirdorî bo kes û koman disekinin. Digel cuhadiyên wan, teoriya rexnegir, postmodernîzm û femînîzm li dijî têgiha serweriya dewletê derdikevin û komeleyên siyasî yên nû pêşbînî dikin ku li hemberî komên marjînal û mehrûm dê hindiktir veder bikin. Teoriya rexnegir li dijî wê vederiyê derdikevin ku li ser bingeha dewletê ava bûye û înkar dike ku berjewendiyên hemwelatiyên welatekî ji berjewendiyên ên biyanî giringtir in. Ew li ser wê yekê pêdagir e ku siyasetmedar her çi qas giringiyê bidin berjewendiyên hemwelatiyên xwe, divê ew qas giringiyê bidin berjewendiyên biyaniyan jî û avahiyên siyasî pêşbînî dike ku ji netewe-dewleta wekî “keleyekê” hişk wêdetir in. Postmodernîzm van tiştan pirsyar dike: angaşta dewletê ya bûyîna navendeke meşrû ya dilsoziyên mirov û mafê dewletê yê empozekirina sînorên civakî û siyasî. Ew piştgiriyê dide ciyawaziya çandî û giringiyê dide berjewendiyên hindikahiyan. Femînîzm angaşt dike ku teoriya realîst pêşdaraziyeke maskulen nîşan dide û femînîzm piştgiriyê dide wê yekê ku jin û nirxên alternatîf daxilî jiyana giştî bibin.

Ji ber ku teoriyên rexnegir û perspektîfên teorîk ên din rewşa heyî pirsyar dikin, zanînê bi desthilatê ve girê didin, û dirûvûteşegirtina nasnameyê û guhertina civakî dupat dikin, ew ne tradîsyonel an ne-pozîtîvîst in. Ew hin caran wekî “reflektîvîst” an “post-posîtîvîst” tên binavkirin (Weaver 165) û bi awayekî radîkal ji “rasyonelîst”a neorealîst û neolîberal an ji teoriyên pêwendiyên navneteweyî yên “pozîtîvîst” cuda

dibin. Ji bo teorîsyenên ewlehiyê yên rexnegir, ewlehî ne diyardeyeke objektîf e. Ewlehî bi awayekî bingehîn civakî ye, bi awayekî civakî ava bûye û dikare wekî bernameyeke siyasî bê bikaranîn. Ewlehî bernameyeke siyasî meşrû dike û wê bernameyê li ser civakê empoze dike ku xizmeta koma serdest dike. Li gor teoriya sekurîtîzasyonê ya rexnegir, aktorê ku sekurîtîze dike, dibe ku siyasetmedar an partiya rêvebir be, "kirdeyekê an komekê wekî tehdîdeke hebûnî bo biresera berbehs pênase dike" (Ari 147). Bireser dibe ku dewletek an komeke ne-dewletî be. Pratîkeke vegotinî ya bi vî rengî tehdîd û xetereyê pênase dike.

Konstruktîvîst, wekî Alexander Wendt, hewl didin ku di navbera van her du nêzîkbûnan de pirekê ava bikin: pozîtîvîst û post-pozîtîvîst, ew vê yekê wiha dikin: ji aliyekî ve bi hesibandina pergala dewletê ya heyî û anarşiyê bi awayekî cidî û ji aliyekî din ve bi lêhûrbûna li ser dirûvûteşegirtina nasname û berjewendiyan. Bi dijderketina li hemberî fikirên neorealîst, Wendt angaşt dike ku alîkarî-bo-xwe ne encameke rasyonel an sedemî ya rêgeza anarşiyê ye. Ew bi awayekî civakî tê avakirin. Vê fikira Wendt kir ku sekna wî etîketa "konstruktîvîzmê" bi dest bixe: nasname û berjewendiyên dewletan bi awayekî civakî tên avakirin. Wekî encam, li gor dîtina wî, "alîkarî-bo-xwe û siyaseta desthilatê sazî ne û ne taybetmendiyên anarşiyê yên esasî ne. Anarşî ew e ku dewlet çi jê fahm dikin" (Wendt 1987 395). Tu mentiqeke anarşiyê ya tekane tune ye lê ji dêvla vê yekê, li gor rolên ku dewlet xwe û hevdu pênase dikin çendîn mentiqên anarşiyê hene. Desthilat û berjewendî ji aliyê fikir û norman ve tên çêkirin. Wendt angaşt dike ku neorealîzm nikare guhertina di siyaseta cîhanê de rave bike, lê konstruktîvîzma wî ya ku li ser normê ava bûye dikare.

Encameke manend, digel ku bi awayekî tradîsyonel hatiye derxistin, ji teorisyên ne-pozîtîvîst ên Dibistana Îngilîz (nêzîkbûna Civaka Navneteweyî) tê ku hem sînordariyên sîstemîk û hem jî yên normatîf ên li ser tevgera dewletan dupat dikin. Bi referansdayîna nêrîna klasîk a xwezaya mirov ku kesan wekî bi awayekî bingehîn sosyal û rasyonel dibîne ku dikarin hevkariyê bikin û ji xeletiyên rabirdûyê dersan bigirin, ev teorîsyen dupat dikin ku dewlet, wekî kesan, xwedî berjewendiyên meşrû ne ku yên din dikarin qebûl bikin û rêzê ji wan re bigirin, û dupat dikin ku

ew dikarin avantajên gelemper ên şopandina rêgezeke dualî di pêwendiyên xwe yên dualî de bipejirînin (Jackson and Sørensen 167). Ji ber vê yekê, dewlet bi rêya peymanan dikarin xwe bi dewletên din ve girê bidin û dikarin hin nirxên hevpar bi dewletên din re bi pêş bixin. Ji ber hindê, avahiya pergala navneteweyî wekî ku neorealîst angaşt dikin ne neguherbar e. Ew ne anarşiyeke Hobbesî ya domdar e ku bi xetereya şer dagirtî ye. Pergaleke navneteweyî ya anarşîk ku li ser bingeha pêwendiyên desthilatê yên di navbera aktoran de ava bûye dikare veguhere civakeke navneteweyî ya hevkarîxwaztir û aştîxwaztir, ku tê de tevgera dewletê li gor wan nirx û norman dirûv û teşe digire ku bi awayekî hevpar tên parvekirin. Mînakeke pratîk a civaka navneteweyî saziyên navneteweyî ne ku di pêwendiyên navneteweyî de rêzika qanûnê diparêzin, bi taybetî NY.

## 4. Encam: Karaktera Realîzmê Ya Hişyarker û Guherbar

Encameke bêhemdî û bêbext a nîqaşa derbarê neorealîzmê de ew e ku neorealîzm û beşeke mezin ji rexneya wê (tevî îstîsnaya diyar a Dibistana Îngilîzî) bi termên zanistî û felsefî yên razber hatiye vegotin. Vê yekê kiriye ku kesekî/e nepispor nikaribe teoriya siyaseta navneteweyî têbigihê û vê yekê her wiha zanista pêwendiyên navneteweyî di nav beşên hevnegirtî de dabeş kiriye. Digel ku armanca realîzma klasîk piştgirîkirina pratîka dîplomatîk û dabînkirina rêberiyekê bo wan kesan bû ku hewl didan tehdîdên potansiyel fahm bikin û çareser bikin, teoriyên îro, ku bi senaryo û projeyên mezin ên cûrbicûr re eleqedar dibin, bo vê peywirê pir ne guncav in. Mihtemelen ev sedema sereke ye bê ka çima eleqeyeke nû bo realîzma klasîk, bi taybetî bo fikirên Morgenthau, çêbûye. Ji dêvla ku wekî formeke dêrîn a fikira realîst a berî-zanistî bê dîtin ku teoriya neorealîst şûna wê girtiye, fikirîna wî niha ji berê komplekstir û wekî ku xwedî pêwendîdariya hevçerx a pirtir be tê dîtin (Williams 2007, 1-9). Fikirîna wî di nav teswîra realîzmê ya ortodoks de pir bi cî nabe ku ew pirî caran pê ve tê girêdan.

Di salên dawîn de, zanyaran di zanista pêwendiyên navneteweyî de vegêranên berbelav ên derbarê tradîsyonên teorîk ên diyar de pirsyar kirine. Thucydides,

Machiavelli, Hobbes û ramangerên din ji nû ve hatin analîzkirin ji bo zordana bikaranînên berbelav ên mîrateyên wan ên di vê qadê de û bo vedîtina tradîsyon û meylên din. Morgenthau jî bi awayekî manendî vê yekê ji nû ve hate şîrovekirin. Gelek zanyaran (Harmut Behr, Muriel Cozette, Amelia Heath, Sean Molloy) giringiya fikira wî wekî çavkaniyeke guherînê bo şîrovekirina realîzmê ya standard tesqîd kiriye. Muriel Cozette bîwarê rexgenir ê realîzma Morgenthau dupat dike ku di van de xwe nîşan dide: di pabendiya wî ya "li ber desthilatê rastiyê biaxive" û ya "eşkerekirina angaştên desthilatê yên bo rastî û exlaq" de û di meyla wî ya daxuyanîkirina angaştên cuda di demên cuda de (Cozette 10-12). Cozette wiha dinivîse: "Morgenthau giringiyeke navendî dide parastina jiyana mirov û azadiyê, û ev her du tişt 'standardeke berz a exlaq' çêdikin ku divê her tim lêkolînên zanistî han bide" (19). Ev yek elastîkiya realîzma wî ya klasîk nîşan dide û pêşbîniyên wî diyar dike ku li ser bingeha piştgirîkirina nirxên exlaqî yên cîhanî ava bûne. Tevî ku Morgenthau wiha dihesibîne ku dewlet aktorên meyldarî desthilatê ne, ew di heman demê de qebûl dike ku ger ne ji sînordarkirinên exlaqî û xebata qanûna navneteweyî bûya, siyaseta navneteweyî dê xerabtir bûya (Behr û Heath 333).

Xebata Robert Gilpin a bandordar a bi navê *Şer û Guhertin Di Siyaseta Cîhanê De* metodeke din bo bipêşxistina teoriyeke realîst a pêwendiyên navneteweyî pêşniyar dike. Ger vê xebatê di zanista PNyê de bêtir cî girtibûya, ji dêvla tevlîbûna nîqaşên teorîk ên bêfêde, em dê îro "bo guhertinên desthilatê yên bilez û guhertina jeopolîtîk" baştir amade bûna (Wohlforth, 2011 505). Me yê karibûya sedemên şerên mezin, maweyên aştiyê yên dûdirêj, û afirîn û qelsbûna pergalên navneteweyî rave bikira. Sepandina vedîtinên zanistî yên nû li ser zanistên civakî metodeke hê dîtir pêşniyar dike. Danîşana vê yekê, wekî mînak, xebata Alexander Wendt a vê dawiyê ya bi navê *Hişê Kûantum û Zanista Civakî* ye. Nêzîkbûneke realîst a nû bo siyaseta navneteweyî dikaribû li ser bingeha nêrîna organîk û tevgir ava bibûya ku ji van tiştan derketibûya holê: ji teoriya kûantumê, ji fikira peresana mirov, û ji hişmendiya rola mirovan di pêvajoya peresanî de ku ev hişmendî her ku diçû bêtir dibû (Korab-Karpowicz 2017).

Realîzm loma ji teoriyeke statîk û xemsar bo exlaq wêdetir e, mirov nikare wê bi

tenê di nav şirove pêwendiyên navneteweyî ya pozîtîvîst de bi cî bike. Ew teoriyeke pratîk e û bi pêş dikeve ku girêdayî rewşên dîrokî û siyasî yên rasteqîn e û taliya talî li gor standardên xwe yên exlaqî û pêwendîdariya xwe ya di dayîna biryarên siyasî yên bibasîret de tê darizandin (Morgenthau 1962). Di şûna reqabeta îdeolojîk a Şerê Sar ê sedsala bîstem, reqabeta sereke di sedsala bîst û yekem de di navbera van de ye: îdeolojiyên ku berfirehbûna dinyayeke yekcemser rast derdixin ku Amerîka tê de serdest e û ew îdeolojiyên ku piştgiriya jinûveavakirina dinyayeke pircemser (Müllerson 2017). Wekî encam, rageşiyên di navbera hêzên mezin de, ku ev rageşî her diçe zêdetir dibin, tevkariya vejîna nîqaşa realîst-îdealîst kirin û bûn sedema eleqeyeke nû bo realîzmê. John Mearsheimer ji vî aliyî ve ramangerekî giring e ku bi têgiha xwe ya reşbîn a realîzma êrîşkar tê zanîn, ku pêşbînî dike armanca dewletên hêzdar, wekî Amerîka, zêdekirina desthilatê û serdestbûna li ser ên din e (Mearsheimer 2001). Jixwe xebata wî ya dawî, *Xafilîna Lîberal* (Mearsheimer 2019), ku ew tê de li hemberî sekneke lîberal angaştên realîst pêşkêş dike, dikare wekî klasîkeke teoriya pêwendiyên navneteweyî bê dîtin.

Wekî ku vejîna berjewendiyê ya vê dawiyê îsbat dike, realîzm teoriyeke bo demên zehmetiyê ye, dema ku ewlehî dibe pirsgirêkeke rasteqîn. Ev yek dema ku welat tên ber xetereya şerekî çekdarî diqewime. Di rewşên bi vî rengî de, realîzm roleke bifêde ya hişyarker dilîze. Ew me li hemberî progresîvîzm, moralîzm, legalîzm û meylên din hişyar dike ku pêwendiya xwe ya bi rastiya berjewendî û desthilatê ji dest didin. Ew hevsengkereke pêwîst e bo baweriyeke zêde xweşbîn a lîberal bi hevkariya navneteweyî û guhertina ku ji pevgirêdayîbûna dualî dertê holê, û ew her wiha hevsengkereke pêwîst e bo angaşteke bi vî rengî ya teoriya rexnegir: bêewlehiya me bi tenê encameke sekurîtîzasyonê ye.

Digel vê yekê, dema ku ew dibe teşebiseke dogmatîk, bi lêhûrbûna bi tenê li ser pevçûnê, realîzm di bicîanîna fonksiyona xwe ya minasib wekî teoriyeke pêwendiyên navneteweyî de bi ser nakeve. Realîzm vediguhere îdeolojiyekê, bi mayîna bi awayekî hişk di nav "paradîgma"yeke dewlet-navendî û gelekî hêsankirî wekî neorelîzmê de û bi înkarkirina îhtimala her bipêşketinê di pêwendiyên navdewletî de. Dupata wê ya li ser siyaseta desthilatê û berjewendiya neteweyî dikare

bo rastderxistina êrîşkariyê bê suîstîmalkirin. Ji ber vê yekê divê ew teoriyên ku teswîra gelekî guherbar a siyaseta cîhanî çêtir rave dikin şûna realîzmê bigirin. Divê normên erênî li fonksiyona wê ya bi tenê nerênî û hişyarker bên zêdekirin. Ev norm ji rasyonelîte û basîreta ku realîstên klasîk dupat dikin; ji vîzyona piralîparêziyê, qanûna navneteweyî û civakeke navneteweyî ku lîberal û endamên Dibistana Îngilîz dupat dikin; heta bi kozmopolîtanîzm û hevgirtina cîhanî ku gelek nivîskarên îro destekê didinê berfireh in.

## Bîbliyografî


Allison, Graham T., 2017. *Destined for War: Can American and China Escape Thucydides's Trap?*, Boston: Houghton Mifin Harcourt.

Ari, Tayyar (ed.), 2022. *Critical Theories in International Relations*, Blue Ridge Summit, PA: Lexington Books.

Aron, Raymond, 1966. *Peace and War: A Theory of International Relations*, trans. Richard Howard and Annette Baker Fox, Garden City, New York: Doubleday.

Ashley, Richard K., 1986. "The Poverty of Neorealism," in *Neorealism and Its Critics*, Robert O. Keohane (ed.), New York: Columbia University Press, 255–300.

–––, 1988. "Untying the Sovereign State: A Double Reading of the Anarchy Problematique," *Millennium*, 17: 227–262.

Ashworth, Lucian M., 2002. "Did the Realist-Idealist Debate Really Happen? A Revisionist History of International Relations," *International Relations*, 16(1): 33–51.

Behr, Hartmut, 2010. *A History of International Political Theory: Ontologies of the International*, Houndmills: Palgrave Macmillan.

Behr, Hartmut and Amelia Heath, 2009. "Misreading in IR Theory and Ideology Critique: Morgenthau, Waltz, and Neo-Realism," *Review of International Studies*, 35(2): 327–349.

Beitz, Charles, 1997. *Political Theory and International Relations*, Princeton: Princeton University Press.

Bell, Duncan (ed.), 2008. *Political Thought in International Relations: Variations*

*on a Realist Theme*, Oxford: Oxford University Press.

——, 2017. “Political Realism and International Relations,” *Philosophy Compass*, 12(2): e12403.

Booth, Ken and Steve Smith (eds.), 1995. *International Relations Theory Today*, Cambridge: Polity.

Boucher, David, 1998. *Theories of International Relations: From Thucydides to the Present*, Oxford: Oxford University Press.

Brown, Chris, 2001. *Understanding International Relations*, 2nd edition, New York: Palgrave.

Bull, Hedley, 1962. “International Theory: The Case for Traditional Approach,” *World Politics*, 18(3): 361–377.

——, 1977. *The Anarchical Society: A Study of Order in World Politics*, Oxford: Clarendon Press.

——, 1995. “The Theory of International Politics 1919–1969,” in *International Theory: Critical Investigations*, J. Den Derian (ed.), London: MacMillan, 181–211.

Butterfield, Herbert and Martin Wight (eds.), 1966. *Diplomatic Investigations: Essays in the Theory of International Politics*, Cambridge, MA: Harvard University Press.

Carr, E. H., 2001. *The Twenty Years' Crisis, 1919–1939: An Introduction to Study International Relations*, New York: Palgrave.

Cawkwell, George, 1997. *Thucydides and the Peloponnesian War*, London: Routledge.

Cox, Robert W., 1986. “Social Forces, States and World Orders: Beyond International Relations Theory,” in *Neorealism and Its Critics*, Robert O. Keohane (ed.), New York: Columbia University Press, 204–254.

Cozette, Muriel, 2008. “Reclaiming the Critical Dimension of Realism: Hans J. Morgenthau and the Ethics of Scholarship,” *Review of International Studies*, 34(1): 5–27.

Der Derian, James (ed.), 1995. *International Theory: Critical Investigations*, London: Macmillan.

Donnelly, Jack, 2000. *Realism and International Relations*, Cambridge: Cambridge

University Press.

Doyle, Michael W., 1997. *Ways of War and Peace: Realism, Liberalism, and Socialism*, New York: Norton.

Galston, William A., 2010. "Realism in Political Theory," *European Journal of Political Theory*, 9(4): 385–411.

Geuss, Raymond, 2008. *Philosophy and Real Politics*, Princeton: Princeton University Press.

Gustafson, Lowell S. (ed.), 2000. *Thucydides' Theory of International Relations*, Baton Rouge: Louisiana State University Press.

Guzzini, Stefano, 1998. *Realism in International Relations and International Political Economy: The Continuing Story of a Death Foretold*, London: Routledge.

Harbour, Frances V., 1999. *Thinking About International Ethics*, Boulder: Westview.

Herz, Thomas, 1951, *Political Realism and Political Idealism: A Study of Theories and Realities*, Chicago: University of Chicago Press.

Hobbes, Thomas, 1994 (1660), *Leviathan*, Edwin Curley (ed.), Indianapolis: Hackett.

Hoffman, Stanley, 1981. *Duties Beyond Borders: On the Limits and Possibilities of Ethical International Politics*, Syracuse: Syracuse University Press.

Jackson, Robert and Georg Sørensen, 2003. *Introduction to International Relations: Theories and Approaches*, Oxford: Oxford University Press.

Kennan, George F., 1951. *Realities of American Foreign Policy*, Princeton: Princeton University Press.

Keohane, Robert O. and Joseph Nye, 1977. *Power and Independence: World Politics in Transition*, Boston: Houghton Miffin.

––– (ed.), 1986. *Neorealism and Its Critics*, New York: Columbia University Press.

–––, 1989. *International Institutions and State Power: Essays in International Relations Theory*, Boulder: Westview.

Korab-Karpowicz, W. Julian, 2006. "How International Relations Theorists Can Benefit by Reading Thucydides," *The Monist*, 89(2): 231–43.

–––, 2012. *On History of Political Philosophy: Great Political Thinkers from Thucydides to Locke*, New York: Routledge.

–––, 2017. *Tractatus Politico-Philosophicus: New Directions for the Development of Humankind*, New York: Routledge.

Lebow, Richard Ned, 2003. *The Tragic Vision of Politics: Ethics, Interests and Orders*, Cambridge: Cambridge University Press.

Linklater, Andrew, 1990. *Beyond Realism and Marxism: Critical Theory and International Relations*, Basingstoke: Macmillan.

Machiavelli, Niccolò, 1531. *The Discourses*, 2 vols., trans. Leslie J. Walker, London: Routledge, 1975.

—–, 1515. *The Prince*, trans. Harvey C. Mansfield, Jr., Chicago: Chicago University Press, 1985.

Mansfield, Harvey C. Jr., 1979. *Machiavelli's New Modes and Orders: A Study of the Discourses on Livy*, Ithaca: Cornell University Press.

—–, 1996. *Machiavelli's Virtue*, Chicago: University of Chicago Press.

Maxwell, Mary, 1990. *Morality among Nations: An Evolutionary View*, Albany: State University of New York Press.

Mearsheimer, John J., 1990. "Back to the Future: Instability in Europe After the Cold War," *International Security*, 19: 5–49.

—–, 2001. *The Tragedy of Great Power Politics*, New York: Norton.

—–, 2018. *The Great Delusion: Liberal Dreams and International Realities*, New Haven: Yale University Press.

Meinecke, Friedrich, 1998. *Machiavellism: The Doctrine of Raison d'État in Modern History*, trans. Douglas Scott. New Brunswick, NJ: Transaction Publishers.

Molloy, Seán, 2003. "Realism: a problematic paradigm," *Security Dialogue*, 34(1): 71–85.

—–, 2006. *The Hidden History of Realism. A Genealogy of Power Politics*, Houndmills: Palgrave Macmillan.

Morgenthau, Hans J., 1946. *Scientific Man Versus Power Politics*, Chicago: University of Chicago Press.

—–, 1951. *In Defense of the National Interest: A Critical Examination of American Foreign Policy*, New York: Alfred A. Knopf.

—–, 1954. *Politics among Nations: The Struggle for Power and Peace*, 2nd ed., New York: Alfred A. Knopf.

—–, 1962. "The Intellectual and Political Functions of a Theory of International Relations," in *Politics in the 20th Century*, Vol. I, "The Decline of Democratic

Politics," Chicago: The University of Chicago Press.

——, 1970. *Truth and Power: Essays of a Decade, 1960–1970*, New York: Praeger.

Müllerson, Rein, 2017. *Dawn of a New Order. Geopolitics and the Clash of Ideologies*, London: L. B. Tauris.

Nardin, Terry and David R. Mapel, 1992. *Traditions in International Ethics*, Cambridge: Cambridge University Press.

Nardin, Terry, 2017. "The New Realism and the Old," *Critical Review of International Social and Political Philosophy*, first online 01 March 2017; doi:10.1080/13698230.2017.1293348

Niebuhr, Reinhold, 1932. *Moral Man and Immoral Society: A Study of Ethics and Politics*, New York: Charles Scriber's Sons.

——, 1944. *The Children of Light and the Children of Darkness: A Vindication of Democracy and a Critique of Its Traditional Defense*, New York: Charles Scribner & Sons.

Pocock, J. G. A., 1975. *The Machiavellian Movement: Florentine Political Thought and the Atlantic Political Tradition*, Princeton: Princeton University Press.

Rosenau, James N. and Marry Durfee, 1995. *Thinking Theory Thoroughly: Coherent Approaches to an Incoherent World*, Boulder: Westview.

Russell, Greg, 1990. *Hans J. Morgenthau and the Ethics of American Statecraft*, Baton Rouge: Louisiana State University Press.

Sleat, Matt, 2010. "Bernard Williams and the possibility of a realist political theory," *European Journal of Political Philosophy*, 9(4): 485–503.

——, 2013. *Liberal Realism: A Realist Theory of Liberal Politics*, Manchester: Manchester University Press.

Smith, Nicholas Ross, Grant Dawson, 2022. "Mearsheimer, Realism, and the Ukraine War," *Analyse & Kritik: Journal of Philosophy and Social Theory*, 44(2): 175–200.

Smith, Steve, Ken Booth, and Marysia Zalewski (eds.), 1996. *International Theory: Positivism and Beyond*, Cambridge: Cambridge University Press.

Scheuerman, William, 2011. *The Realist Case for Global Reform*, Cambridge: Polity.

Thompson, Kenneth W., 1980. *Masters of International Thought*, Baton Rouge: Louisiana State University Press.

——, 1985. *Moralism and Morality in Politics and Diplomacy*, Lanham, MD: University Press of America.

Thucydides. *History of the Peloponnesian War*, trans. Rex Warner, Harmondsworth: Penguin Books, 1972.

——. *On Justice, Power, and Human Nature: The Essence of Thucydides' History of the Peloponnesian War*, Paul Woodruff (ed. and trans.), Indianapolis: Hackett, 1993.

Vasquez, John A., 1998. *The Power of Power Politics: From Classical Realism to Neotraditionalism*, Cambridge: Cambridge University Press.

Waltz, Kenneth, 1979. *Theory of International Politics*, Boston, MA: McGraw-Hill.

Walzer, Michael, 1977. *Just and Unjust Wars: A Moral Argument with Historical Illustrations*, New York: Basic Books.

Wendt, Alexander, 1987. "Anarchy is What States Make of It: The Social Construction of Power Politics," *International Organization*, 46: 391–425.

——, 1999. *Social Theory of International Politics*, Cambridge: Cambridge University Press.

Weaver, Ole, 1996. "The Rise and the Fall of the Inter-Paradigm Debate," in *International Theory: Positivism and Beyond*, Steven Smith, Ken Booth, and Marysia Zalewski (eds.), Cambridge: Cambridge University Press, 149–185.

Wight, Martin, 1991. *International Theory: Three Traditions*, Leicester: University of Leicester Press.

Williams, Bernard, 1985. *Ethics and the Limit of Philosophy*, Cambridge: Cambridge University Press.

——, 2005. "Realism and Moralism in Political Theory," in *In the Beginning was the Deed: Realism and Moralism in Political Argument*, ed. G. Hawthorn, Princeton: Princeton University Press, 1–17.

Williams, Mary Frances, 1998. *Ethics in Thucydides: The Ancient Simplicity*, Lanham, MD: University Press of America.

Williams, Michael C., 2005. *The Realist Tradition and the Limit of International Relations*, Cambridge: Cambridge University Press.

——, 2007. *Realism Reconsidered: The Legacy of Hans Morgenthau in International Relations*, Oxford: Oxford University Press.

Wohlforth, William C., 2008. “Realism,” *The Oxford Handbook of International Relations*, Christian Reus-Smit and Duncan Snidal (eds.), Oxford: Oxford University Press.

——, 2011. “Gilpinian Realism and International Relations,” *International Relations*, 25(4): 499–511.

## Çavkaniyên Înternetê Yên Din

- Political Realism, entry the *Internet Encyclopedia of Philosophy*.
- Political Realism, entry in *Wikipedia*.
- Melian Dialogue, by Thucydides.
- The Prince, by Machiavelli.
- *The Twenty Years' Crisis* (Chapter 4: The Harmony of Interests), by E.H. Carr.
- *Principles of Realism*, by H. Morgenthau.
- *Peace and War*, by Raymond Aron.
- *Globalization and Governance*, by Kenneth Waltz.